

<https://doi.org/10.35859/jms.2020.681328>

LÊKOLÎNEK LI SER QEWMÎYETA BABA TAHİR*

Mehmet Nur YAVUZER¹

PUXTE

Gotara “Lêkolînek Li Ser Qewmîyeta Baba Tahir” radihêje ku Baba Tahir bide nasîn û li ser qewmîyeta wî raweste. Di vê xebatê da pêşîyê nav û nasnavên Baba Tahir hatine nasandin, derbareyê qelenderiyê da agahî hatîne dayîn, piştra li ser qewmîyeta Baba Tahir hatiye rawestan. Di van salên dawîyê da li ser qewmîyeta wî angaştek hatiye kirin ku ev xebat radihêje li ser vê angaşê raweste, derbareyê qewmîyeta helbestvan hinek diyarde û belge pêşkeş bike, bi belgeyên dirokî li ser mijarê hûr be û mijarê şîrove bike.

Peyvên Sereke: Baba Tahir, Qewmîyet, Kurd, Faris, Ziman, Lor/Lûr, Lek.

Baba Tahir’in Kavmiyeti Üzerine Bir Araştırma

ÖZ

“Baba Tahir’in Kavmiyeti Üzerine Bir Araştırma” makalesi Baba Tahir’i tanıtmakta ve onun kavmiyeti üzerinde durmaktadır. Bu araştırmada öncelikle Baba Tahir’in ismi ve mahlasları tanıtılmış, Kalenderîlik hakkında bilgi verilmiş, daha sonra onun kavmiyeti üzerinde durulmuştur. Son yıllarda onun kavmiyeti hakkında bir iddia ortaya atılmış ki bu araştırma bu iddia üzerinde yoğunlaşmakta, şairin kavmiyeti ile ilgili bazı bilgi ve belgeler sunmakta, tarihi belgeler ile konu üzerinde durmakta ve konuyu yorumlamaktadır.

Anahtar Kelimeler: Baba Tahir, Kavmiyet, Kürt, Fars, Lor/Lur, Lek

* Ev gotar ji ber binbeşeke teza Lîsansa Bilind a bi navê *Baba Tahir di Wêjeya Kurdî da* hatiye girtin ku tez ji Zanîngeha Yûzûncû Yil, Enstîtûya Zimanên Zindî, Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî ra, di mêjûya 13/06/2016an da hatiye pêşkeşkirin.

¹ PhD Candidate in Bingol University, Kurdish Language and Literature Department / Xwendekarê Doktorayê li Zanîngeha Bingolê Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî

E-mail: mehmetroniyavuzer@gmail.com,

ORCID: 0000-0002-5648-5743

Article Type/Makale Türü: Research Article / Araştırma Makalesi

Received / Makale Geliş Tarihi: 28.01.2020 - **Accepted / Makale Kabul Tarihi:** 06.08.2020

A Research On Baba Taher's National Identity

ABSTRACT

This article entitled 'A Research on Baba Taher's National Identity' aims to introduce Baba Taher and focus on his national identity. In this study we first give name and nickname of Baba Taher together with information on Qalederyah. Then we focus on Baba Taher's national identity. There are some claims on Baba Taher's identity in last years hence this study aims to focus on these claims by presenting some proof and documents on his nationality, focus on his identity via historical documents and interpret the situation.

Keywords: Baba Taher, Nationality, Kurd, Persian, Lor/Lur, Lek

Destpêk

Baba Tahir (937-1010) yek ji helbestvanê pêşîn yê Îranî ye. Di van salên dawîyê da li ser qewmîyeta² wî nîqaşîyek tê kirin. Ev nîqaşî bi zimanê helbestên wî dest pê dîke û li ser zimanê helbestên wî qewmîyeta wî jî tê kifşkirin. Lê, ji ber ku helbestên wî yên resen negihîştine li ber dest û bi domara demê ji aliyê ziman va guherîn li ser helbestên wî qewimîne, ev rêbaza li ser zimanê helbestên wî kifşkirina qewmîyeta wî nagihîje encameke teqez. Ji ber vê, belgeyên dîrokî û helbestên wî yên ku di destnivîsên kevn da cih digirin alîkarî didin mijare me. Lê divê neyê jibîrkin ku helbestên wî yên ku di destnivîsên kevn da gihîştine roja me jî ne resen in ku jimara wan jî gelek kêma in.

Di destpêkê da divê em vê bînin ziman ku ev mijara ku em li ser radiwestin li gorî rihê serdema Baba Tahir nîne. Di heyamên klasîk da aîdîyet zêdetir li ser dîn û mezheban teşe girtiye (Öztürk, 2014: 66). Di serdema Baba Tahir da hestên dînî li ser helbestvanên sûfî bi bandor bû ku ev rewş hem di helbestên helbestvanan û hem jî ji teşeya jîyana helbestvanan da dîyar dibû ku Kemikli ji bo serdema helbestvanên sûfî tîne ziman ku; "ramana dînî ya helbestvanê sûfî, jîyana wî dirûvandiye û wî hestên dînî bi awayekî tîr jîyaye, mijarên ku bi xwe ceribandîye û hewandiye, veguhazîye li ser hunerê. Huner, ji bo helbestvan kêrî pêşkeşkirina rastîya ku pê hisyaye û têgihîştîye hatiye. Gotina bi hikmet ya helbestvanê sûfî, bi huner û lîrîzmê va nixumîye. Di serdema piştî Îslamê da bi awayekî giştî were fikirîn, dê were dîtin ku dîn çavkanîya xebatên edebîyatê ye (2013: 5)." "Baba Tahirê Uryan piranîya temenê xwe bi tesewîfê ra derbaz kirîye. Dest ji lezet û kêfa cîhanê berdaye, guh nadaye kinc û nivîn, ji xwarin û vexwarinê çêj hilnedaye (Sağniç, 2002: 71)." Ji berhem û teşeya jîyana wî derdikeve der ku ji bo helbestvan û qelenderekî mîna Baba Tahir ra qewmîyet ji

²Qewmîyet/ethnicity/قومیت (https://fa.wikipedia.org/wiki/قومیت).

alîyê girîngîyê va ne li pêş e. Di serdema wî da “dîn” û “ramana dînî” li pêş “qewmîyet”ê ye. Girîngî li ser dîn, mezheb, terîqet û xirqeya dînî ya helbestvan e. Serdema ku Baba Tahir lê jîyaye, ne tenê helbestvanê sûfîyê misilman, herwiha helbestvanên bawerîyên din jî bi hest û îlhama dînî helbest nivîsandine. Wek mînak; “Piraniya helbestên helbestvanên kurd yên ku li ser bawerîya Yarsan bûne, “li ser Xwedênasî, rêz û rêçikên Xwedênasîyê bûne (Sağniç, 2002: 49).” “Baba Tahir, wek sûfîyek, têgihîna tesewifê bi hemû heyîna xwe hewandîye û jîyaye. Ew di helbestê xwe da zêdetir bala xwe daye Xwedê û heyînê, di vî warî da bador li mutesewifên peyhatîyên xwe kiriye û li ser kemilîna nêrîna tesewifê kartêker bûye (Tenik, 2015: 182-183).

Di wê serdemê da hunera helbestvan, ew helbesta ku bi pîvan e û naveroka wê zêdetir dîn û eşqa îlahî ye, girîng e. Herwiha girîngî li ser tesewuf û sofîzmê ye. Heke di wê serdemê da qewmîyeta helbestvanekî hatibe ziman jî ew ne li gorî nêrîn û nirxandina netewetîya serdema modern e. Di wê serdemê da bûyerên mîna belavbûna Îslamîyetê, xurtbûn û têkoşîna mezheban, berxwedana li ser pêyan mayîna dînê Zerdûşt, Yarsan û Êzdîyan diqewimîn. Herwiha xurtbûna desthilatîya ‘Ereban ya li ser axa Îranê, ya li ser axa Kurdan, Farisan û qewmên din pêk hatiye.

Baba Tahir di dîroka edebîyata Farisî da di bin serenava ‘Hebestvanên Îranî’/‘Helbestvanên Farisî/Parsî’ cih digire. Di dîroka edebîyata Farisî da derbareyê wî da agahî wiha ye: “Baba Tahir, helbestvanê sedsala 5’an (bi mîladî sedsala 11’an) yê serdema Sultan Tuxrûl Begê Selçûqî ye. Dubeytîyên wî bi lehceyê Lorî ye. Ji ber navdarî û xweşikbûna helbestên wî ji aliyê gelê Farisîziman va guherîn li ser zimanê dubeytîyan hatiye pêkanîn û helbest ji zimanê xwe yê resen dûr ketine. Zimanê helbestên wî yên berê û yên niha ji hev cuda ne. Herwiha zimanê dubeytîyan bi Farisîya Derî va hatiye nêzîkirin (Sefa, 1369/1990: 384).³ Di dîroka edebîyata Kurdî da jî ew wiha cih digire: “Baba Tahirê Uryan, Kurd e û ew wek helbestvanê pêşîn yê Kurd tê pejirandin (Sağniç, 2002: 70). Tê dîtîn ku di dîroka edebîyata Farisî da derbareyê qewmîyeta wî da agahîyeke rasterast cih nagire. Behs li ser zaravayê helbesta wî ye ku zaravayê helbestê wek Lûrî hatiye danezan. Ji ber serenava mijara ku di dîroka edebîyata Farisî da cih digire, em têdigihîjin ku Lûrî wek zaravayê Farisî hatiye pejirandin. Di dîroka edebîyata Kurdî da jî derbareyê qewmîyeta Baba Tahir da rasterast agahî heye ku ew wek Kurd hatiye danezan.

Kurdên ku ji mêj va ne Baba Tahir ji xwe dizanin, bertek li angaştê Farisbûna Baba Tahir nîşan didin ku ev bertek û rexne di nivîsên lêkolînerên wan da jî dîyar dibe. Me’rûf Xeznedar dîyar dîke ku “li ser Baba Tahir xebatek ji aliyê Mihemed kurê Îbrahîm ku nasnava wî Xetîbî Wezîrî ye hatiye kirin. Wî hewl daye çî belgeyên derbareyê Baba Tahir da hebe hemûyan berhev bike. Lê di

xebata wî de ramana Pan Îranîzmê eşkere xuya dike. Ew bi ramana nijadperestî li ser xebatê hûr bûye. Ji ber helwesta wî ya nijadperestî xebat ji rewîştana zanistiyê dur ketiye. Di xebata wî de Baba Tahir ji nasnameya xwe ya rast durketiye û di nav çarçoveya Farsîzmê de hatiye dorpêçkirin (2001: 194). Feqî Huseyn Sağniç dibêje: “Ji bo neyê gotin ku wêjeya Îranê ya pêşîn ji aliyê yekî Kurd va (Baba Tahir) hatiye nivîsandin; beşek ji Farisan înkara Kurdbûna Lûrîyan dikin” (2002: 69).” Selim Temo vê angaştê bi serdema neteweperestiyê va girê dide û dibêje; “*wisa tê têgihîştin ku sazkarê edebiyata Îranê yan jî edebiyata Îranî ji ber ku Faris nîne, aciziyek dide û ji ber vê aciziyê tevgera Farisîkirina Baba Tahirê Uryan pêk tê ku ev tevger heta guherîna hin bêjeyên helbestên wî didome*” (2013: 1333). Xeznedar dibêje; gava ku em li ser zimanê dubeytîyên Baba Tahir radiwestin, dibînin ku di navbera dubeytîyên Baba Tahir û zimanê Farisîya nû de tu tîkili tune. Faris ji ber vê pirsgrêkê ji bo berjewendiyên xwe, xwe bi Pehlewîyê ve girê didin û dibêjin zimanê Pehlewî maka zimanê Farisî ye. Çira dibêjin Pehlewî maka Farisî ye? Ew bi ramana “Pan Îranîst” nêzikî vê mijarê dibin û hewl didin ku hemû tiştên resen bi Farisî ve girê bidin. Heke ev kesan ne Pan Îranîst bin wê gavê ji bo çî li ser zimanê dubeytîyan û zaravayên Kurdî lêkolîn nakin. Tenê dibêjin Pehlewî Farisî ye û ji nav vê mijarê derdikevin (2001: 191-193).

Guherîna zimanê helbestên wî êdî ji aliyê lêkolîneran va teqez hatiye pejirandin ku yek ji wan lêkolîneran Ebdulhuseyn-ê Zerrînkûb di pirtûka xwe ya *Custucû der Tesewîfê Îran* da diyar dike ku “berhemên Baba Tahir bi zimanê xwe yê resen nemane û zimanê berhemên wî hatine guherandin (h. 1376: 181-187). Derbareyê vê guherînê da çend mînak: “bêjeya ‘vac’⁴ bi bêjeya Farisî ya ‘goften’ê va û bêjeya ‘ker’ bi bêjeya Farsî ya ‘kerden’ê va hatine guherandin. Ev herdu bêje, vac (gotin) û ker (kirin) bi Kurdî ne (Azkaii-Minorsky, 1995: 118). Giştîyê pirtûkên qedîm helbestên wî nêzikî zimanê Lûrî dane zanîn, lê ew di dibeytîyê xwe da xwe wek Lek daye zanîn (<https://fa.wikipedia.org/wiki/>). Lêkolînerên ku bi awayên zanistî û bê alîgirî, bi bêhînfîreh li ser Baba Tahir xebitîne, zimanê wî wek zimanê devera wî dane zanîn ku ev ziman, zimanê serdema wî ya ku li rojavayê Îranê hatiye axaftin e. “Di lêkolînen li ser peyvên dubeytîyên Baba Tahir hatine kirin da tê dîtin ku peyvên dubeytîyan peyvên zaravayên rojavayê Îranê ne (Azkaii, 1995: 105-112)” ku li rojavayê Îranê piranî Kurd binecih in. Çend mînak ji peyvên helbestên Baba Tahir yê ku di destnivîsa Qumî (Bahaudîne Qûmî, 848: 89-90) da cih digirin û wateya wan yê bi Kurdî (Kurmançî) û Farisî:

⁴Vac: Kurdî ye û tê wateya “gotin”ê. Di gelek helbestên Baba Tahir de “vac” hatiye bikaranîn. Di pirtûka Pervîz Azkaii ya bi navê “Baba Tahir-Name” de 24 dubeytin Baba Tahir wekî mînak hatiye dayîn ku di wan da “vac” hatiye bikaranîn (bnr. Azkaii, b.n.).

Tablo 1: Çend mînak ji peyvên helbestên Baba Tahir

Peyva Dubeytîyê	Bi Kurdî	Bi Farisî
neçîrvan	nêçîrvan	şîkarçî
waxwerd	vexwar/wexward/xwardiyewe	nuşîd
edxwerd	edxwerd/edxword/ ⁵ vedixwar	mî xord
ov	ov/av	ab
nebî	nebî/nebû	nebû
e	e/ez	men
te	te	to
rût	rût	oryan, lext, bêrehnê
nej	nej/ne jî	ne hem
dal	dal	oqab
tule ⁶	tule	nêhal
kirê	kir	kerd
dî	dî	dîd
henî	hê jî / henî ⁷	henuz
ro	ro/roj	rûz
beşûm	biçim	birevem
mûrîc	mûrî/morî	mûrçe

Ji ber ku peyvên li jor yên helbestan ji çavkanîyeke kevn hatiye wergirtin, zêdetir nêzîkî Kurdîyê xuya dibin. Herwiha wisa xuya dibe ku peyvên helbestan yên çapên nû jî zêdetir nêzîkî Farisîyê ne. Xodayî di helbesta Baba Tahir da behsa pîrzimanîya helbesta wî dike û dibêje, “meriv hin nimûneyên Farisî-Lorî

⁵edxwerd/edxword: Di devokên Kurdî yên herêmên Sine, Kirmanşah, Hemedan Îlam û hwd. da heye. Di zimanê Kurdî da wek qertefa dema niha zêdetir “di/de” tê bikaranîn, lê di hin herêmên Kurdan da “ed” jî tê bikaranîn. Heta di Sine, Merîwan û Baneyê dewsa ‘di/de’yê ‘e’ tê bikaranîn, anga ‘d’ jê ketiye ‘e’ tenê maye. Wekî mînak: **diçim: eçim, dekem: ekem** û hwd.

⁶Nêhal, di zimanê Kurdî da tule ye (ji Merdox neql: Zerrînkûb, h. 1376: 112).

⁷henî: Di zaravayên Kurdî da tê bikaranîn (Zerrînkûb, h. 1376: 108).

yên mîna dîwana Mola Manuçehr û hin kesên din da hene bîne li ber çavan, “mumkun e ku Baba Tahir jî helbestên xwe bi zimanê Farisî, bi zarava û zimanên din yên herême ristibe (1392/2013).” Hin kes Lûrîyê, wek zaravayê Farisîyê, hin kes jî wek zaravayê Kurdîyê dibîne (Ji Êşmît/Schmitt, Emanollahî neql: Xodayî, 1392/2013). Xodayî li ser Farisî Lûrî û Kurdîyê radiweste, dibêje ji hev veqetandina sînore erdnîgarîyê ya zimanê Kurdî û Farisîyê dijwar e. Hin kes destpêka zimanê helbesta Baba Tahir wek Fehlewî-Lûrî-Kurdî dide zanîn ku zimanê hebestên wî hatiye xerabkirin, hin kes jî Baba Tahir wek Farisîziman dizanin. Kesên ku Baba Tahir wek Lûr zanîne wî wek Lek dane zanîn. Ew dibêje, dibe ku despêka zimanê helbesta Baba Tahir bi Farisî, zarava û zimanên din yê herême va têkel be (1392/2013).

1. Jîyana Baba Tahir

Navê bajarê Baba Tahir Hemedan e ku ew; bajarekî kevnar e. Ew li vî bajarê da jîyaye û li wir çûye ser dilovanîya Xwedê. Ew, di herêma ku lê jîyaye da mirovekî navdar bûye. Ew wek qelender û derwêşekî jîyaye. Derbareyê wî da kêma agahî gihîştine roja îro (Yazıcı, 2012: 370-371). Hemedan bajarek jî bajarên Îranê ye û Baba Tahir jî helbestvanekî Îranî ye (Destgirdî-V. Minorsky, 1929: 573).

Li ser rojbûn û koçdawîya wî da hinek angaşên cuda hebin jî, lihevkinerek jî heye ku bi hesabê ebedê hatiye dîyarkirin, ew di mîladî sala 937’an da ji dayik bûye û di sala 1010’an da jî koça dawîyê kiriye (Minorsky, 1997: 167). Gora wî li bakurê rojavayê Hemedanê di taxa Bûnê Bâzâr da li ser girekî piçûk û di hundurê turbekî da ye. Li ser dîwarê turbê hin helbestên wî nivîsar in. Gora Fatime û derwêşê Baba Tahir ê bi navê ‘Elî Neqî Koserî li cem gora Baba Tahir in (Ji Dâ’iretu’l-Me’ârif-ê Bozorgê Îslâmî vghz. Secadî, h. 1391: 180). Sağniç dîyar dike ku Baba Tahir di serdema “Dûgela Deylemî”yan (920-1005) da jîyaye ku gelê Deylemî li rojavayê Îranê, di çiyayên hawîrê Geylanê da nişetecih bûn. Ji bajarê Hemedan û Kirmanşahê bigirin heta çemê Dicleyê di bin desthilatîya wan da bûye. Wan nêzikî sêsed salan bi artêşa Îslam-“Ereban ra şer kirine, piştra jî Îslamîyetê pejirandine û gelek mizgeft û medrese ava kirine. Di vê dûgelê da helbestvanên Kurd ên navdar; Baba Sirincê Kelatî, Babe Gerçekê Hewramî, Daye Tewrêzê Hewramî û Evidilemedê Babekî ne (2002: 68).

Navê helbestvan “Tahir” e ku wateya peyva “tahir” paqîjbûn û bêlekebûn e (<https://ku.wiktionary.org>). Helbestvan bi çend bernavan tê naskirin. Ev bernav; “Baba, Uryan, Lorî, Lûristanî û Hemedanî” ne (Destgirdî, 1929: 577). Yekem berhema ku navê wî wekî Tahir tomarkiriye, berhema bi navê “Nameyan” e û ev berhema ya ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî ye. Berhema navborî di sala h. 520-525’an da hatiye nivîsîn (Yıldırım, 2013: 14).

Bernava “baba” ji bo Tahir cara yekem di pirtûka Rawendî ya bi navê “*Rahetu’s-Sudûr we Ayetu’s-Surûr Der Tarîxê A’lî Selcûq*” da cih girtiye. Di pirtûkê da ew bi navê “Baba Tahir” cih digire. Di gotûbêja Baba Tahir û ya

hikûmdarê Selçûqî Tuxrûl da dîyar dibe ku hikûmdarê Selçûqî ji Baba Tahir ra rêzeke bilind girtiye û daxwazên Baba Tahir pejirandiye (Rawendî, h. 473: 99). Lê divê were zanîn jîyana Baba Tahir ya ku bi hesabê ebcedê bi dest ketiye derfet nade ku gotûbêj di navbera Baba Tahir û hikûmdarê Selçûqî Tuxrûl da pêk hatibe. Baba Tahir berîya hatina Hemedanê ya Tuxrûl Beg çûye li ser dîlovanîya Xwedê. “Peyva “baba” ji demên kevn da ji bo rêberên bawerîyan ra hatiye bikaranîn. Peyva “baba” ji bo rêzgirtina mezinên Yarsan, Bektaşî, Qelenderî, Melametî, Hayderî, Nûqtewî û Hurûfî ra hatiye bikaranîn” (Azkai, 1995: 128-130).

“Uryan” peyveke “Erebî ye û di Kurdî da wateya vê peyvê “rût” e (<https://ku.wiktionary.org>). Ev peyv şêweya jîyana wî nişan dike, ku ji ber ramana wî ya felsefeya sofîzmê û jîyana wî ya derwêşî, bixwe yan jî kesên din jê ra “uryan” gotine (Xeznedar, 2001: 184). Ji vê bernavê em ji arifî û sofîtiya wî haydar dibin. Di dîroka terîqetan da ji bo derwêşên ekola Qelenderîyan peyva “uryan” hatiye bikaranîn. Baba Tahir jî ji pêşengên vê ekolê tê hesibandin (Adak, 2013: 107).” Wî guh nedaye tiştên dine yê badilhewa, cil û bergên kevn û kincên ji rezê li xwe kiriye. Xwe ji qirêjîyên dinê şûştiye, paqij kiriye, evîneke rût û tazî jîyaye. Her ew e xwe bi bendê eşqa Xwedê va girêdaye. Wî, vê bernava “uryan” di çarîneke xwe da wiha bi lêv kiriye:

Nezûnem rût û ‘uryanim kî kerde
Xwudem cellad û bî cûnum kî kerde
Bide xencer ke ta sîne kunem çak
Bebînem ‘îşq ber cûnum çî kerde (Yıldırım, 2013: 16).

Nizanim kî ez tazî’w uryan kirme
Ez ku cellad im, kî ez bêcan kirme
Xencerkê bidin, ez sîng biqelêşim
Bibînim ku ev eşq, çî bi can kirye (Kara, 2012: 87).

Bernaveke wî ya din jî “lorî” ye (Yazıcı, 2012: 370). Ew, wekî “Baba Tahirê Lorî/Loristanî” jî tê naskirin. Şerefhanê Bedlîsî (1543-1604), di Şerefnameya (wî, vê berhemê di sala 1597’an da qedandiye) xwe da tîne ziman, ku “Lor/Lûr” beşek ji Kurdan in. Sînor û kewşênê Kurdan ku navê wê Kurdistan e, ji ser qeraxên zeryaya Hurmûzê ku dikeve ser zeryaya Hîndî, dest pê dike û ji wir xetek rast dikişîne, tê heta digihîje Meletî û Mereşê (Bedlîsî, 2014: 63). Di pirtûka rêzimanê ya Qanatê Kurdo da di pêşgotinê da gelek agahî derbareyê dîyalektên Kurdî da hene, ku P. Lêrx⁸ zimanê Kurdî li ser pênc dîyalektan dabeş kiriye ku ew wiha ne: Kurmancî, **Lûrî** (Lorî), Kelhurî, Goranî û Zazakî.

⁸ P. Lêrx: Yek ji lêkolînerên Rûsî yê ku li ser ziman û etnografyaya Kurdan xebitîne û lêkolînên xwe di salên 1856-1858’an da li Petersburgê belav kirine ye (Qanatê Kurdo, 2010: 19).

Zimanas Y. Son di sala 1913'an da bi navê rêzimana Kurdî pirtûkek dinivîse û çapdike ku di pêşgotina berhema xwe da zimanê Kurdî li ser çar dîyalektan dabeş dike, ku ew wiha ne: Kurmancî, Goranî, **Lûrî** (Lorî) û Zazakî (Qanatê Kurdo, 2010: 19).

Ji ber ku ew ji Hemedanê ye, ji wî ra “Baba Tahirê Hemedanî” jî dibêjin. Ev bajar bajarekî kevnar û navendeke mutesewîf e, di serdema Medan da paytextê dewleta Medan bûye û di dîrokê da cîhekî kurdnîşîn e ku rûniştivanê vê welatê Arî angî Îranî ne (Rawlinson, 2006: Pêşgotin 7-9,71). Ew di dubeytîyeke xwe da vê bernava xwe wiha dîne ziman:

Mû an espîdebaz em Hemedanî
Lane der kûh darem der nihanî
Be balê xwud perem kûhan be kûhan
Be çengê xwud kerem nexçîrbani(Yıldırım, 2013: 18).

Ez ew bazê spî yê Hemedanî
Mi l'ser çiyê hêlîn heye nihênî
Bi baskê'xwe difirim li ser çiyân
Ez bi çengê' xwe dikim nêçîrvanî (Kara, 2012: 113).

Tê dîtîn ku nav û barnavên wî ku ew tahir, baba, uryan, lorî û hemedanî ne, her yekî wan parçeyên nasnameya wî ne, herwiha ev parçeyan wî bi giştî bi me didin nasîn.

3. Helbestvan, Qelender û Baba Tahir

Baba Tahir ji aliyê huner û ramana xwe va helbestvan û ramangêrekî pêşeng bû (Ocak, 2004: 119-127). Ew mirovekî sofî û dildar bû. Ew bi berhemên xwe bingeha wêjeya Îranê ya nivîskî ye (Sağniç, 2002: 69). Ji wî resenên berhemên wî nemane. Li pişt mirina wî berhemên wî belawela û hinekî wan jî wînda bûne. Lê dîsa jî ew bi berhemên xwe ji hemû dijwarîyên demê ra derbaz bûye û xwe gihandiye roja îro. Derbareyê wî da gelek kêma agahî hatine peydakirin. Gelek dubeytîyên wî li piştî koçdawîya wî bi sedsalan şûnda ji devê mirovan hatine berhevkin. Nivîskarên tezkîreyên kevn ên Faris di pirtûkên xwe da cih nedane Baba Tahir. Jixwe tezkîreyeke Kurdî hetanî vê gavê nehatîye bidest xistin ku em Baba Tahir di wê da bigerin. Baba Tahirê ku di sala 1010'an da çûye li ser dilovaniya Xwedê, di dawîya sedsala 19'an û sedsala 20'an da bala hin lêkolînerên rojavayî kişandiye û wan derbareyê Baba Tahir da lêkolîn kirine (Yavuzer, 2016: 89). Dema ku em wî didin li ber helbestvanên ji neteweyên cuda yê serdema wî, em dibinin ku berhemên wî bêxwedî mane û di serdema wî da li pişt wî tu patronaj jî tune ye ku wî û berhemên wî biparêzin. Ew ne mîna hin helbestnûsên serdema wî bi qesr û qonaxan va hatibe vexwendin û piştgirîkirin. Şêx, pîr an jî pêşengekî wî tune. Ji agahîyên derbareyê wî da dîyar dibe ku wî xwebixwe gihandiye. Derbareyê vê da Şiwan dibêje; “rêber û pîrekî

Baba Tahir tune. Ew sofîyekî ûyîsî ye, yanê ew xwebixwe fêrkiriye û gihandiye. Ew ji hemû qonaxên sofîgerîyê derbaz bûye û bi yekbûna fenayê ve gihîştîye (2012: 30-31).” Şa Xoşîn⁹ ku ew rêberêkî Yarsan e û di heman demê da ferîştîyekî bawerîya Yarsan e, ji bo Baba Tahir dostekî girîng e. Baba Tahir vê dostanîya xwe di helbestên xwe da anîye ziman ku di serpêhatiyên Yarsanan da jî dostanîya Şa Xoşîn û ya Baba Tahir dîyar e (Xeznedar, 2001: 188).

Sağniç tîne ziman ku helbestnûsên Îranî yê pêşîn Baba Tahir e ku ew wekî bavê wêjeya nivîskî ya Kurdî tê pejirandin (2002: 70). Divê were zanîn ku helbestnûsê herî pêşîn yê Îranê ne Baba Tahir e, ku yê berîya wî helebest nivîsîne jî hene. Nivîskarên tezkîreyan û dîroknasên edebîyatê anîne ziman ku li piştî helbestvan Behram Gûr (?-438) helbestên Farisî nehatîne gotin, heke hatibin gotin jî ji ber desthilatdarîya “Ereban ya Îranê û ji ber serdestîya zimanê “Erebî li Îranê helbestên helbestnûsan nehatine tomarkirin. Yekem helbestvanê Farisî yê piştî îslamê Ebû Abdullâh Cafer b. Muhammed Rudekî ye. Rûdekî di sedsala III./IX.’an da li gundekî Semerkandê tê dinê û di sala 940’anda koçadawî dike (N. Yıldırım, 2015:133,146). Yanê ew sê sal piştî rojbûna Baba Tahir diçe li ser dilovanîya Xwedê. Rudekî (940) helbestvanê herî mezin yê Qesra Bûharayê bûye ku ew di wê demê da helbestvanekî dewlemend bûye. Di nav helbestvanên Farisî da yekem xwedî dîwan ew e. Ew dîroka Taberî ya Mezin werdigerîne Farisîyê û wezîrê dewleta Samanî yê bê navê Belamî ku ew hezkerê Rûdekî bûye, ji bo Rûdekî dibêje; di nav helbestvanên “Ereb û Ecemen da manendê wî tune. Helbestvanên bi navên Ûnsûrî (961?-1030/1041), Ferûhî (?-1037), Fîrdewsî (940-1020), Mewlana (1207-1273) û Hafiz (1317-1390) xwe wek xwendekarê Rûdekî dane nasîn û nirxa Rûdekî nişan dane. Rûdekî bingeha “Helbesta Pesnî ya Şêweya Xorasanê” avêtîye, ku wî zêdetir pesn li emîrên dewleta Samanîyan û kesên qesrê kiriye (N. Yıldırım, 2015:143-145,169). Serdema jîyana Baba Tahir û helbestvanên mîna Rûdekî, Ûnsûrî û Fîrdewsî nêzîkî hev in, lê ev her sê helbestvan ji herêma Xorasanê û Baba Tahir jî ji Lûristanê ye. Di çavkanî û tezkîreyan da em rast li agahiyên ku têkilî bi Baba Tahir û helbestvanên mîna Rûdekî, Ûnsûrî û Fîrdewsî daynin nehatin. Dibe ku hinceta vê ji ber cudatîya zimanê Baba Tahir yan jî teşeya bawerîya wî be jî.

“Navdarîya Baba Tahir ji ristina helbesta wî tê (Modarreszadeh, 1392/2013: 96) ku teşeya helbesta wî, helbesta Îranê ye berîya Îslamê ya ku bi navê fehlewîyatê tê binavkirin bi bîr tîne (Ji Zerînkûb neql: h.b: 96). Mehrdad R. Izady dibêje: “Kêşa taybet ya helbestên Baba Tahir ji kevneşopîya helbesta Kurdan ya berîya Îslamê tê û ev kêş li başûr û navîna Kurdistanê ji alîyê helbestnûsên Kurd yê serdema berîya Îslamê hatiye bikaranîn” (2013: 311). Her wiha ew di dîrokê da

⁹Şa Xoşîn: Şa Xoşînê Lûristanî bi helbestên xwe va di edebîyata Kurdî da xwedî cihekî girîng e. Ew kurê Celala Xanima Lorsîtanî ye. Hemû helbestên Şa Xoşîn li ser rêbaza yarî hatine rastin û tevî helbestên xwe li ser perdeya Xwedanasînê nivîsîne. Di heman demê da Şa Xoşîn yek ji rêberên bawerîya Yarsan (Ehlê Heq) e (Sağniç, *h.b.*, 91-93).

ji yekem ramangêrên wehdetê wicûdê ye, ku di dîrokê da vê ramanê, wî yekem car anîye di nav helbestê û ramana sofîzmê bi deste wî di nav helbestê da xwe nîşan daye. Xeznedar derbareyê vê wiha dibêje: “Em dikarin Baba Tahir damezirînerê “Helbesta Sofîzimê” bibînin û bipejirînin. Baba Tahir ne tenê damezirînerê Helbesta Sofîzmê ya Kurdî ye her wiha damezirînerê beşeke Sofîzma Îslamî û ya Kozmosî ye jî (2001: 202).” Ew jîyaneke derwêşî domandiye û di dîrokê da yekem car xwe wekî qelender daye nasîn (Azamat, 2001: 253). Qelender, ew kesên ku têkilîya xwe ji dinê birîne û ber bi Xwedê ve beralîbûne ne. Ev nav ji endamên terîqeta Qelenderîyê ra tê gotin (Cebecioğlu, 2004: 343).

Di dîrokê da piranîya terîqetan bi taybet di erdnîgarîya Kurdan, Xorosan û Anatolyayê da hebûne. Lêkolîner derbareyê vê mijarê da wiha dibêjin: Rêvebirên “Ereban di serdema Emewîyan da dest bi ber bi cîhanê va beralîbûnê kirine, bi tevger û rewîştên nijadperestîyê tevgerîyane. Gelên ne “Ereb li hemberî rewîştên “Ereban ên nijadperestî û derveyî Îslamî, nerazîbûn nîşan dane û ber bi jîyana manevî va beralîbûne. Ekolên tesewifî, raman û nêrînen heterodoks ên tesewifî, bi taybet di erdnîgarîya Kurdan û Xorosanê berbelav bûne. Her wiha mitesewif û sofîyên ku ji van her du herêman gihîştine ji bo ragihandina ramanên xwe yê tesewifî çûne Anatolya, Maweraunehîr û Bexdayê. Şêx û derwêşên ku ji van herêman rabûne hewl dane ku hemberî kirin û rewîştên ku aramî û hizûra gel ji holê radikin, aramî û hizûrê di nav civakê da peyda bikin. Di nav van ekolan da yê herî navdar Melamî û Qelenderî ne ku Melamî nemaze di nav sofîyên Tirkmenan da Qelenderî jî di nav sofîyên Kurdan da derketine, ku ev her du ekolên tesewifî ekolên heterodoks in. Şêweya jîyana evdalên ku Îslamîyet belavê rojava û herêmên din kirine, li ser bingeha derwêşên Kurd sazûbûye. Belam evdalên Kurd ji evdalên Tirkmenan ra jî rêberî kirine (Kerim, 2011: 270-277). Yek ji wan qelenderan Baba Tahir e ku ji helbest û agahîyên derbareyê wî dîyar dibe ku ew rahiştîye ji civakê ra bibe awêne, rêberîya civakê bike û rêya wan ronî bike. Wî li hemberê dijwarîyan hêza tabkirinê nîşan daye. Ew ji bo bigihîje armanca xwe dest ji her tiştî şûştîye, erdê ji xwe ra kiriye cî û nivîn, kevîr jî ji xwe ra kiriye belgî û xwe serdanpê spartîye Xwedê. Yekem car di dîrokê da wek helbestvanek Baba Tahir ji xwe ra “qelender” gotîye û wî hal û jîyana qelenderîyê xwe di helbesta xwe da wiha anîye ziman:

Mû an rindûm ke namim bî qelender
Ne xan dîrum ne man dîrum ne lenger
Çû roz aye begerdem girdê koyet
Çû şew aye be xiştan wanehem ser

Ez ew rind im ku navê min qelender
Ne xan û malên min hene ne lenger

Dema dibe roj li dora mala te digirim
Dema dibe şev kevir datînim bin ser (Yıldırım, 2013: 136).

3. Qewmîyeta Baba Tahir

Di van salên dawî da her ku li ser Baba Tahir lêkolîn zêde bûn, ew bêtir hate nasîn û navdar bû. Dubeytîyên wî yên ku ji hêla hunerê va serkevtî ne û kev in, di qada edebîyatê da Baba Tahir derxistin pêş. Dubeytîyên wî yên resen, hê jî bi dest neketine. Dubeytîyên wî ji devê kesan û ji destnivîsan hatin berhevkerin û çapkirin. Niha di çapên cuda yên dubeytîyan da tê dîtin ku heman dubeytî di çapên cuda da ji alîyê bêjeyan va ji hev cihê ne. Dîyar dibe ku gelên Îranê li gorî ziman û zaravayê xwe dubeytîyan vegotine, herwiha her nivîskarek jî bi teşeya xwe ya edebî û bi çêja zimanê xwe dubeytîyên Baba Tahir nivîsîye. Bi vî awayî dubeytî ji resenê xwe dûr ketine. Ji ber ku resenê dubeytîyan ne li ber dest in, zimanê helbesta wî jî wek pirsgirêkek derdikeve pêş. Lewra zimanê helbesta wî li gorî dubeytîyên ku ji hêla ziman va guherîn derbaz kirine tê kifşkirin. Bi vî kifşkirina zimanê dubeytîyan, qewmîyeta Baba Tahir jî tê dîyarkirin ku ji ber ku resenê dubeytîyan ne li holê ne, ev rêbaz bi xwe ra şaşîyek derdixe holê û rêbazeke ne rast e. Di encama lêkolînên li ser zimanê dubeytîyan da em dikarin bêjin Baba Tahir helbestên xwe ne bi zimanê serdest yê wê serdemê yê Îranê ango zimanê edebîyata Îranê ku ew zimanê Farisî ye, nivîsandiye, ew bi zimanê xwe yê zikmakî dubeytîyên xwe nivîsîye û ev zimanê wî zimanê qewmê wî ye. Wê gavê qewmîyeta Baba Tahir were kifşkirin, zimanê helbesta wî ya resen jî dê dîyar be.

Heta sedsala 20'an ji alîyê Farisan va Kurdbûna Baba Tahir hatiye pejirandin. Lê piştî vê sedsalê ev rewş guherî. Di sedsala 21'an da hin kes derbareyê qewmîyeta Baba Tahir da angaştek anîne holê û dibêjin ku ew Faris e. Bi vî gotinê pirs, neteweya Baba Tahir kîjan e? hate rojevê. Piştra, pirs, gelo divê Baba Tahir bi berhemên xwe di nav dîroka kîjan edebîyatê da cih bigire? dê were pirsîn. Helbet ji bo bersiva vê pirsê zimanê helbestên wî girîngiya xwe derdixe pêş. Lê ev xebeta me raste rast ne li ser zimanê helbestên wî ye. Ev angaşta ku Baba Tahir Faris e ji bo ku Kurdbûna Baba Tahir birîzîne, helbet hewceyê belge û dîyardeyan e. Herwiha bi vî angaşte jî êdî ji Kurdbûna Baba Tahir tiştêk tê xwestinê ku ew jî xwe ispat bike. Ji ber ku derbareyê wî agahî gelek kêr in, resenên berhemên wî tune ne û ji alîyê hin lêkolînerên Kurdî va hêvî ji dîtina resenên berhemên wî hatine birîn, vê ispatkirinê diwartir dike. Dikare were gotinê ku hewceyê ispatê tune, jixwe ew berê berda Kurd e, ji alîyê piraniya gelê Îranê va wek Kurd hatîye zanîn, ev têra her tiştî ye. Lê ev gotin qada zanistê têr nake. Tê dîtin ku êdî ji herdu alîyan va jî hewceyê ispatê derdikeve holê. Dema ku em vî angaşta ku ji alîyê hin Farisan va hatiye rojevê dinihêrin, dibînin ku li nav Farisan hemû kes vî angaşte nakin, gelek lêkolîner û

mamosteyên zanîngehên Îranê dibêjin; em baş nizanin ew ji kîjan neteweyê ye, an jî hinek ji wan Kurdbûna Baba Tahir dipejirînin. Nivîskar û lêkolînerên ku li ser Baba Tahir xebitîne yên mîna Perwîz Natil Xanlerî, Mêhrdad Behar, Ebdulhuseynê Zerrînkûb, Perwîz Azkaii, Wehîd Destgirdî, Reşîd Yasmî zimanê dubeytîyên Baba Tahir wek Farisî û qewmîyeta Baba Tahir jî wek Farisî nîşan nedane. Nivîskarên Kurd û gelê Kurd yekpare dibêjin, ku bê guman Baba Tahir Kurd e, esl û resenê helbestên wî Kurdî ye (Yavuzer, 2016). Dema ku em berê xwe didin lêkolînerên Tirkîyê yek ji wan Fuad Köprülü (1890-1966) ye ku Baba Tahir wek helbestvanekî ku bi lehçeya deverî nivîsandiye daye zanîn (Köprülü, 1980: 186). Lê wî diyar nekiriye ku ev lehçe/zarava ya kîjan zimanî ye. Qismek lêkolînerên Tirkîyê yên ku behsa Baba Tahir kirine û yên ku helbestên wî bi Tirkî va wergerandine, Baba Tahir wek Farisî berhemên wî jî wek berhemên edebîyata Farisî nîşan dane. Bo mînak: Ahmet Faruk Çelik dibêje; helbestên Baba Tahir wek neynûkeke bîrçok ya edebîyata Farisî ye (2015: 247). Lêkolînerên rojavayî yên ku bi awayekî zanistî û bêhinfîrehî li ser Baba Tahir xebitîne yên mîna; Clement Huart, Heron Allen, L. Leszcynski, K. Hadank, E.G. Browne, Edward-Brenton, Elizabeth Curtis û Vladimir Minorsky Baba Tahir wek Farisî yan jî zimanê berhemên wî wek Farisî nîşan nedane. Ew zêdetir li ser zimanê berhemên wî rawestiyane û zimanê helbestên wî wek zimanê deverî ya devera Baba Tahir dane zanîn. Hinekên ji wan têkilî zimanê berhemên wî bi Kurdîyê va danîne, hinek gotine zimanê berhemên wî Lûrî ye, hinek ji wan jî gotine zimanê dubeytîyan bi zimanê zaravayên rojavayê Îranê va têkilî in (Yavuzer, 2016: 143-bnr). Li Îranê, di ferhenga Dêhxweda¹⁰ da hatiye nivîsandin ku zimanê Baba Tahir dişibe zimanê Lûrî (دهخدا، 1373: ذیل باباطاهر). Lêkolîner, zimanê helbestên wî yên ku ne resen in dişibîne Lûrî, lê ew yekrû ne Lûrî ne. Di Meceleya Armaxanê (مجله آرمغان) ya xebata Wehîd Destgirdî ya ku li ser Baba Tahir hatiye amadekirin da tê ziman ku niha jî di navbera Hemedan û Xoremebadê da zimanê deverî gelek zêde ne ku têkilîya zimanê helbestên Baba Tahir bi hîç awayî bi yek ji wan zimanên deverî va nehatiye danîn ku dibe ku bi hemûyê wan zimanên deverî va tevlihev e (Destgirdî, 1928: 578).

Baba Tahir yek ji helbestvanên destpêka edebîyata nivîskî ya Îranê ye. Helbesta wî bi huner e û pêşketî ye. Hêjabûna hunera wî balê dikişîne li ser xwe. Ew bi berhemên xwe aîde kîjan edebîyata neteweyekê be, ew edebîyat xurtir û rengîntir dibe. Ji ber vê, qewmîyeta Baba Tahir bi pirsgirêk dibe. Dubeytîyên helbestên Baba Tahir yên ku berdest in, yên çapên nû ku ji aliyê Farisan va hatine kirin, ku resenê dubeytîyan jî li holê tune ne û hêj nehatine dîtin, piştgirî dide angaştê Farisîbûna Baba Tahir. Wisa xuya dibe ku dubeytîyên wî yên ku bi awayekî devkî va hatine veguhastin bi awayekî sirûştî guherîna xwarine û yên ku hatine çapkirin jî her cara ku dubeytî hatine çapkirin ber bi zimanê Farisî va guherîna li ser dubeytîyan da qewimîne û di çapên dawîyê da dubeytî êdî nêzikî zimanê Farisîyê bûne. Ev nêzikbûn piştgirî dide angaştê ku Baba Tahir Farisî e.

¹⁰ Dêhxweda: Navê ferhengeke girîng ya Farisîyê ye.

Lê divê neye ji bîr kirin ku zimanê helbestên Baba Tahir yê ku di pirtûka destnivîsî ya Bahaudînê Qumî ya ku di sedsala 15'an da hatiye nivîsîn, ji zimanê helbestên wî yê çapên dawîyê cudatir e, lewra zimanê wan helbestan ji Farisîyê û ji çapên dawîyê dûr in. Herwiha dema ku em dêna xwe didin dubeytîyên ku berdest in, di nav dubeytîyan da komek peyv hene û di Farisîyê da tune ne, ku Faris ji wan peyvan fêr nakin, herwiha ew peyv peyvên zarava û devokên Kurdî ne. Di dubeytîyan da komek peyv jî hene ku peyvên hevpar ên zimanên Kurdî û Farisî ne. Ev herdu koma peyvan jî astengî ji bo angaştên ku zimanê dubeytîyên wî Farisî ne nexwe ew jî Faris e, derdidixin holê. Mijareke din li ser “nasnava Baba Tahir ya ku Lûr e yan jî “Lûristanî (Destgirdî, 1929: 577)” ye, rûpelekê ji bo vê nîqaşîyê zêde dike. Vê carê ji bo qewmîyeta û zimanê Baba Tahir, Lûr û Lûristan dibe mijareke girîng. Li Îranê bayeke nerm ya pişavtin/asîmilasyonê li ser herêma Lor/Lûr û Lekan heye ku yê vê angaştê dînin ziman dibêjin Lûr ne Kurd in, ew şaxeke Farisan e. Xuyê vê angaştê dibêjin zimanê ku Baba Tahir di helbestê da pêk anîye heke Lûrî be, dibêjin Lûrî jî beşek an jî zaravayeke Farisîyê ye û bi vê helwestê, binê angaştên xwe dadigirin. Bi vê awayî, him Lûr him Baba Tahir dibin Faris.

Niha di cîhanê da di qada edebîyatê da bi piranî ya ku tê pejirandin ev e, ku nivîskarek yan jî helbestnûsek bi kîjan zimanî nivîsandibe ew dibe ji wê neteweyê. Lê ev rewş ji bo serdema klasîk hinek diguhere. Derbareyê Mewlana da ev nîqaşî di navbera Tirk û Farisan da heye ku her du alî jî Mewlana ji xwe û yek ji helbestvanekî ji edebîyata xwe dizanin. Lê rewşa Mewlana ne mîna ya Baba Tahir e ku zimanê berhemên Mewlana yekrû Farisî ye. Em wisa têdigihîjin ku hin lêkolîner kakil û qalîkê berhemê ji hev vediqetînin. Hinên wan jî li gorî ruhê serdemê tevdiagerin. Bo mînak Gürsel Aytaç wiha dibêje; di dîroka edebîyata me (Tirkî) da şopandina edebîyatên neteweyên cuda her tim heye. Edebîyata Tirkî ji ber pirneteweyîbûna dewlata Osmanî, derî ji zimanên din ra jî vekiriye. Bo mînak, wan berhemnivîsandina bi zimanê Farisî, ku di wê serdemê zimanekî xweşik û kurwate bû da tu arîşe nedîtine. Îro, ev rêgeza ku dîyarkirina edebîyata neteweyî, bi zimanê berhemê va dîyar dibe, di rabirdûyê da bi awayekî cuda hatiye pêkanîn. Ji ber vê çima ku Mewlana Mesnewîya xwe bi zimanê Farisî nivîsandîye, gelek zanyarên edebîyata rojavayî rahiştine ku Mewlana di nav edebîyata Farisî da nîşan bidin, ev jî dibe sedemê gelek şaşîtîyan (2019: 33-34). Tê dîtin ku Aytaç di warê edebîyatê da serdema netewew-dewletê û ya împaratorîyê ji hev vediqetîne û rêgeza niha ya ku nivîskar bi kîjan zimanê nivîsandibe bi berhemên xwe dibe malê wê edebîyatê, ji bo serdema klasîkê napejirîne. Yanê ew, di serdema berîya netewew-dewletê da zimanê berhemê na, qewmîyeta nivîskar/helbestvan derdixê pêş. Wê gavê helbestnûsekî/ê berîya serdema netewew-dewletê bi zimanê berhema xwe na, bi aîdîyeta/nasnameya netewetîya xwe di nav edebîyata neteweya xwe da cih digire. Ev ramana Aytaç e ku rexne li rêgezekê dike. Nîqaşîya ku em derbareyê

qewmîyeta Baba Tahir dikin ew eslê xwe ji kîjan neteweyê ye û zimanê wî ye resen kîjan e. Zimanê berhemên wî yên destnivîsa kevn vê angaştê ku zimanê helbestên Baba Tahir Farisî ye pûç dîke ku zimanê wan helbestan ji yên çapên nû cudatir in ku ew îspateke guherîn xwarina dubeytîyên wî ye. Helbestên wî yên ku gihîştîne roja me, yên herî kevn di sedsala 15'an da ji aliyê Bahaudînê Qûmî va hatine nivîsîn ku (Bahaudînê Qûmî, Pirtûka Destnivîsî, Mevlana (Etnografya) Müzesi İhtisas Kütüphanesi, h. 848), ew du bend û heşt çarîn in. Divê were gotin ku Qûmîyê ku ew Faris e, wan dubeytîyan ji ku wergirtîye û li ser van helbestên Baba Tahir li gorî çêja xwe ya edebî guherîn pêk anîye yan na, nayê zanîn. Dema ku em van helbestan dinîherin, em dibînin ku ev helbest ji Farisîyê dur in, ji aliyê ziman va ji helbestên wê serdemê yên ku bi Farisî hatine nivîsîn jî cudatir in, yanê zimanê wan helbestan ne Farisî ne. Zêdetir nêzikî zarava û devokên rojavayê Îranê ne.

Nikitin (1885-1960) derbareyê edebîyata nivîskî da, di edebîyata klasîk ya Kurdî bi taybet helbesta lîrîk da, li Bakûr wek bîngeh Elî Herîrî û li rojhilatê başûr jî Baba Tahir dibîne. Nikitin dîne ziman ku helbesta lîrîk ya Baba Tahir di hawîrdora başûrê rojhilata Kurdistanê di nav gelên wir bi awayekî berfireh berbelav bûye. Ev helbest li Îranê, ji aliyê zimanê modern ya Îranê bi temamî nehatîye helandin û mihandin. Helbestên Baba Tahir ji aliyê herêmekî hê jî tê pejirandin, gelek nêzikî rêzîkên axaftinên Kurdîyê ye û hinek taybetîyên diyalektên Kurdîyê diparêzin (2013: 473-475). Challiand, di pirtûka xwe ya "Helbesta Tirkî û Kurdî" da tîne ziman ku edebîyata kurdî ya klasîk di nav çanda Îslamê da xwedî cihekî girîng e û ji bo vê jî wek mînak Baba Tahir dide nîşan (Ji Challiand neql: Gökpınar-Geliş, 2016: 59). Piştî van agahîyan, em berê xwe bidin hinek dîyarde û belgeyên ku derbareyê qewmîyeta Baba Tahir in.

'Elî Şerî'etî (1933-1977) di pirtûka xwe ya "Hubut der Kevir" da dibêje: "*Baba Tahirê Uryan ku ew yekî Kurd bû. Çû kete binê avê û serî ji binê avê derxist, bû arîf. Arîfek him jî çî arîfek, di hundir da bi qasî cîhanan ronahî, bi qasê asoyan merîfet, zerya bi zarya zanîn, hestîyarî ji derûnîya wî derbû û kelîya*" (Shariati, 2009: 180). Bi vê gotina xwe 'Elî Şerî'etî, Baba Tahir wekî arîf, xwedî merîfet, ehlê nûr û ronahîyê û bi qasî zeryayan zana dibîne. Her wiha dîyar dîke ku Baba Tahir ji rastîya hebûnê fêhm kiriye û têgihîştîye. Ew, derbareyê qewmîyeta Baba Tahir da agahî dide û dibêje ev arîfê zana Kurd e.

Îbrahîm Ehmed Şiwan secereya Baba Tahir wiha diajo: "Baba Tahir birayê Baba Yusif e. Baba Yusif bavê Baba 'Elî ye. Baba 'Elî jî bavê Şêx Îsa û Musayê Berzincî ye. Seyidên Berzincî jî ji neviyên Şêx Îsa ne û ew jî Kurdên sûnî ne" (2012: 23).

Gotina Baba Tahir ya ku "Emseytu Kurdîyyen ve esbehtu "Erebîyyen" (Ez ketim xewê Kurd bum û sibehê hişyar bûm "Ereb im) li hawîrdora ku lê jîyaye gelek navdar e. Lê derbareyê vê gotinê da angaşteke din heye ku ev gotin ya Ebû'l-Wefayê Kurd (1026-1107) e (Cuneydê Şîrazi, 1328: 510-516). Ji bo vê

angaştê wekî dîyarde û belge jî pêşgotina mesnewîya Mewlana nîşan dane. Lê divê were zanîn Mewlana di mesnewîya xwe da navê Ebû'l-Wefayê Kurd neanîye ziman. Mewlana (kd. 1273) di pêşgotina mesnewîya xwe da pesnê Hesên Husemeddîn Çelebî dide û dibêje:

Hesênê kurê Muhammedê kurê Hesên, Beyazîdê wextê û Cuneydê demê, Siddîqê kurê Siddîqê kurê Siddîq e, Xwedê ji wî û ji wan xweş/razî be. Ew eslê xwe ji bajarê Urmîyeyê ye û ew ji nesla şêxê rêzdar ê xwediyê gotina “Emseytu Kurdîyyen ve esbehtu “Erebîyyen e. Xwedê rihê wî û yên xelefên wî pîroz bike. Çi serborîyek delal û bav û bapîr û çî delalîyeye xelef û kur! Xwediyê nijada ku ji alîye tavê va qeftan (cil û berg) li wan hatiye kirin e. Ji esleke ku tîrêjênstêrkan li cem wan xuya nakin e (Mevlâna Celâleddîn Rûmî, 2004: 36).

Bi vê gotinê Mewlana him pesnê Çelebî dide û him jî pesnê neslê wî dide. Hesên Husemeddîn Çelebî Kurd e û ew li cem Mewlana mirovekî gelekî qenc e. Li gorî hin nivîskaran qesda Mewlana ya ku Çelebî ji nesla wî ye Ebû'l-Wefayê Kurd e. Lê di pêşgotina Mesnewîya xwe da Mewlana ne navê Ebû'l-Wefayê Kurd (1026-1107) û ne jî navê yekî din ji bo xwediyê vê gotinê anîye ziman. Divê neyê ji bîr kirin ku ew nivîskarê ku ji mesnewîyê derketiyê rê û gotiyê gotina “Emseytu Kurdîyyen ve esbehtu “Erebîyyen” dibe ku ya Ebû'l-Wefa ye (Cuneydê Şîrazî, 1328: 510-516), dibe ku nizane gotin ji mêjva ne ji alîyê Îranîyan va tê zanîn ku ya Baba Tahir e (Şiwan, 2012: 23).

Pirtûka “Dîwanî Kamil Baba Tahir Hemedanî” ya ku ji neşrîyata Meeceleya Armaxanê (مجلة أرمغان) ye ku ew behsa Baba Tahir dike dibêje ew, ji bo xwendinê dikeve hewza qeşemgirtî û di sibetirê nûrek ji ezmana tê dikeve devê wî û ew dibêje “Emseytu Kurdîyyen ve esbehtu “Erebîyyen” (Baba Tahirê Hemedanî, 1932: كد-كه). Destgirdî di kovara Armaxanê da ku derbareyê Baba Tahir da agahî daye û dubeytîyên wî weşandiye, dibêje Heron Allen û Zukuskî vê gotina navborî wek gotina Baba Tahir dane nîşan (Destgirdî, 1929: 586).

Di pirtûka Cuneydê Şîrazî (kd. 801/1399?) ya bi navê Şeddu'l-'Izar (Şeddu'l-'Izar fî hattî'l-evzar 'an zuvvarî'l-mezar / شَدَّالِازار فِي حَطِّ الْاِوزَارِ عَنْ زُوَارِ / المزار) ê da ku wî vê berhema xwe di sala hicrî şemsî 791 / mîladî 1389'an da qedandiye (Bilgin, 1993: 125), li ser gotina “Emseytu Kurdîyyen ve esbehtu “Erebîyyen” hatiye rawestan. Dema ku em pirtûkê dinihêrîn, em dibînin ku di pirtûkê da li ser gotinê ya kê ye tê rawestan û navên kesên mîna Îbn Yezdanyar, Ebu Ebdullahê Babûyî, Tacûlarîfîn Ebû'l-Wefa û Baba Tahir derbaz dibin. Di pirtûkê da têkilîya Hesên Husemettîn Çelebî bi hin kesan va tê danîn û li ser Kurdbûna Hesên Husemettîn Çelebî û wan kesan tê rawestan. Di dawîyê da derbareyê Tirkbûnê û Kurdbûna Çelebî da tê gotin ku Çelebî ji Urmîyeyê (Wirmîye) ye, ew di serdema Mewlana da li Konyayê jîyayeye, li wê serdemê li Konyayê her kes wî wekî Kurd zanîye, Mewlana jî wî wekî Kurd daye nîşandan. Nivîskar dibêje, ji ber vê jî ew bi awayekî Eşkere Kurd e. Di pirtûka Şeddu'l-'Izar'ê da, Nivîskar gotina navborî wekî ya Baba Tahir jî nîşan dide, lê li ser

Kurdbûn an jî Kurdnebûna Baba Tahir ranaweste. Di vir da balkêşîyek derdikeve der ku wekî mînak nivîskar çira derbareyê Kurdbûn yan jî Tirkbûna Çelebî nîqaşî dîke û dema ku mijar tê li ser Baba Tahir li ser qewmîyeta wî vê nîqaşîyê nake. Raterast têkilîya gotinê bi Baba Tahir va dadîne. Wisa tê dîtîne ku nivîskar di Kurdbûna Baba Tahir da tu guman nabîne ku li ser qewmîyeta wî ranaweste. Nivîskar dema ku li ser vê gotinê nîqaşî dîke dikaribû bigota ji ber ku Baba Tahir ne Kurd e, ev gotin ne ya wî ye. Lê di encama nîqaşîya vê gotinê da nivîskar vê negotiye, nexwe dikare were gotin ku nivîskar bê guman Baba Tahir wekî Kurd dizane. Mewlanayê Romî di mesnewîya xwe da nîşan bi vê gotinê kiriye û bi şêweyê biraz, şîroveya vê gotinê kiriye (Muînuddîn Ibnu'l Qasim Cuneydê Şîrazî, h. 1328: 510-516):

راز صبحنا عربیا بخوان

سرامسینا لکردیا بدان

(Mevlânâ Celâleddîn Rûmî, Gelenek, 2004: 428)

Raza ku min şevê wekî Kurd derbaz kir bizane.

Raza ku em wekî ‘Ereb derketine berbangê bixwîne.

(Mevlânâ Celâleddîn Rûmî, Yeni Şafak, 2004: 149).

206

Mawlana di Mesnewîya xwe da li ser gotina: “Ez ketim xewê Kurd bum û sibehê hişyar bûm “Ereb im” helbesta jor nivîsandiye. Ev gotin, di mesnewîya Mawlana da di nav rêzên helbestên wî da derbaz dibe ku em di nav wan rêzan da şîroveya bûyera Baba Tahir ya bi xwendakarên medreseyê û hewza qeşemgirtî bi ramanên tesewîfî va dibînin. Mawlana derbareyê razê û ilma veşartî da agahî dide û bendên li jor wiha didomîne: “Ew, ilma ku bîpirtûk, bêmamoste û bêhînkêr di dil da peyda dibe vedibêje. Ev ilma nepen a biraz a ku di Baba Tahir da peyda bûye, ku Mawlana dîyar kiriye, ilma pêxemberan e” (Mevlânâ Celâleddîn Rûmî, Yeni Şafak, 2004: 148-149).

Derbareyê vê mijarê da Ansîklopedîya Îslamê wiha dibêje: Çawa derbareyê kerametên helbestvanên sofî ên mîna Attar, Celâleddînê Rûmî û Hafîzê Şîrazî gotinên balkêş hene, bi heman awayî derbareyê jîyan û kerametên Baba Tahir da jî gelek gotinên balkêş hene. Li gorî gotinan, ji rojan rojekê Baba Tahir, ji feqîyên medreseya Hemedanê pîrsa; “ji bo bîdestxistina zanîne divê çî bê kirin” dipirse. Feqî henekên xwe bi wî dikin û ji wî ra dibêjin, divê tu şeveke zivistanê di nav ava hewza qeşemgirtî da bimînî. Baba Tahir, şîreta wan pêk tîne û di nav ava qeşemgirtî da heta sibehê dimîne. Berbangê ronahîyek tê dikeve devê wî, qêrîn jê diçe û wiha dibêje: “Emseytu Kurdîyyen ve esbehtu “Erebîyyen” (Ez ketim xewê Kurd bum û sibê hişyar bûm “Ereb’im). Bi vî awayî ew bi ronîya zanîne ronî dibe. Tê gotin ku ji wê rojê pê da êdî hemû rêyên zanîne li ber Baba Tahirê Uryan vedibin û pêdivîyên zimanan jî pêk tînin. Li piştî vê bûyerê, ew dibe xwedîyê ilmeke bilind û bi xwendekarên medreseyê ra

axaftinên felsefî û tesewîfî dike (Minorsky, 1997: 171). Em di vê buyera Baba Tahir da hîn dibin ku ew xwedîyê ilmekî biraz e ku vê ilmê ji mamoste û pirtûkan negirtiye. Di vê bûyerê da xuya dibe ku ilm di Baba Tahir da bê vîna wî peyda bûye ku ev cure ilm, ilma biraz e. Dema ku em bûyera Baba Tahir û gotinên Mewlana yê helbesta wî didin berhev, dibînin ku di navbera bûyera Baba Tahir û gotinên Mewlana da têkilîyeke xurt heye ku helwest bûyer, gotina Baba Tahir û gotinên Mewlana hev û du tamam dikin. Di vê têkilîyê da eşkere dibe ku helbesta Mewlana ya jor derbareyê gotina Baba Tahir û bûyera wî agahî dide. Mewlana him behsa ilma biraz dike û him jî Kurdbûna xwedîyê gotinê tîne ziman.

Di vê gotina, “Ez ketim xewê Kurd bum û sibê hişyar bûm ‘‘Ereb’im’’ da tê dîtîna ku di derûnîya Baba Tahir da guherînek qewimîye. Herwiha di pirtûka Ömer Uluçay ya “Ehl-i Hak Baba Tahir Uryan Zerdûşt” da tê gotin ku ji ber ku di serdema Baba Tahir da êrîşên “Ereban li ser erdê Kurdan va qewimîne û ji ber zext û zor û desthilatîya “Ereban ya li ser Kurd û erdê Kurdan pêk hatîye, Baba Tahir vê gotinê anîye ziman (Uluçay, 2010: bnr). Herwiha li ser vê gotinê, şîroveyeke wiha jî heye; dibe ku di vê gotinê da Kurdbûn mirovekî ji rêzê, nezan û cahil temsîl dike, “Erebbûn jî meşayiqê seyr û silûkê, qewmê bi edeb, fezîlet û zanebûn û misilmanîyê sembolize dike be (Cuneydê Şîrazi, 1328: 516). Tê dîtîna ku gotina Baba Tahir ya navborî di van her du nêrînê da jî hatiye nixandin. Lê em van herdû şîroveyan jî napejirînin. Lewra dema ku em Baba Tahir ji berhemên wî yê helbest û Kelîmatu’l Qisar ya ji gotin û aforîzmên tesewîfî nasdikin, ji fikr û ramana wî, felsefeya hebûna wî, eşqa wî ya Xwedayî û nixnedayîna wî ya mal û milken cîhanî têdigihîjin, Baba Tahir ne ew kes e ku ji ber êrîşên tirsnaq yê ‘Ereban guherîna xwe ya ji Kurdî bi ‘Erebî bîne ziman, herwiha ew ne ew kes e ku navê qewmê Kurdan bi cahilî û nezanîyê teşbîh û sembolîze bike. Em li ser wê bawerîyê ne ku guherîna ku Baba Tahir di gotina xwe da anîye ziman, guherîneke têgihîştinî ye û ev guherîn di hiş û derûnîya wî da qewimîye. Heron Allen ew kes e di mêjûya 1900’an da li ser Baba Tahir lêkolîn kiriye û ew tîne ziman ku “Emseytu Kurdîyyen ve esbehtu ‘‘Erebîyyen’’ li bajarê Hemedanê wekî gotina Baba Tahir bi nav û deng e (Allen-Brenton, 1902: 16-20). Xêncî van, lêkolîner Jûkûskî dibêje ku min li bajarê Tehranê bihîstîye ku ev gotin ya Baba Tahir e (Şiwan, 2012: 24). Tê dîtîna ku Ansîklopedîya Îslamê û lêkolînerên ku me bi çavkanîyên wan nîşan dane têkilîya vê gotina navborî bi Baba Tahir dadînin yan jî wek ya Baba Tahir didin nîşandan û bi vê nîşandanê qewmîyeta wî jî dîyar dikin.

Me’rûf Xeznedar dibêje: Em dikarin Baba Tahir heta cihekî wekî Goran hesab bikin. Her çî qas zaravayê wî yê devera Hemedanê be jî ew Goranî dizane û heta niha dergevanê gora wî bi zaravayê Goranî diaxivin (2004: 28). Izady dîyar dike ku Baba Tahir helbestvanê xwezayê ye û xwedîyê zimanê Lekî/Goranî ye. Ji ber ku Baba Tahir di nav xwezayê de jiyaye û hakimê zimanê Lekî/Goranî û

Farisîyê ye, ji bo mirovên her du neteweyan (Kurd û Faris) xwediyê nirxekî bilind e. Kêşa taybet ya helbestên wî ji kevneşopîya helbesta Kurda ya berîya Îslamê ya ku di başûr û navîna Kurdistanê belav bû da tê. Îlahiyên pîroz ên pirtûka Cîlve ya Şêx Adî ku ew rêberê Êzdiyan e, bi Şêweyê helbestên Baba Tahir hatine nivîsîn (Izady, 2011: 311). Zaravayê Goranî zimanê helbestên irfanî û mezhebî yên Kurdan e. Di heman demê da ev zarava di erdnîgarîya Kurdan da bûye zimanê wêjeyê. Helbestvan û arifên Kurdan bi zaravayê Goranî berhemên xwe nivîsandine. Helbestvanên mîna; Şa Xoşîn, Baba Bozorg, Fatime Lore, Molla Perîşan, Xan Elmas, Torke Mîr ku ew di herêma Lekan da jîyane, Xolam Rêza Erkevazî, Şake, Xan Mensûr, Seyyêd Yeqûbê Mahîdeştî û Seyyêd Salêhê Mahîdeştî ku ew jî bi zaravayên Kelhorî û Feylî axivîne, bi zaravayê Goranî helbest nivîsandine. Têkilîya Baba Tahir jî bi devok û zaravayên Kurdî yên din ra heye ku ew di dubeytîyeke xwe da dibêje ez Lek im. Di dubeytîyên Baba Tahir da peyvên ku di Kurdîya Goranî û Lekî da tên bikaranîn hene (Abbarîkî, h. 1392: 29).

Baba Tahir di helbesteke xwe da xwe wekî “Lek” dide nasîn ku Lek jî ji hozeke / êleke Kurdan in. Baba Tahir berîya Hemedanê, heyamek li Girînê jîyaye ku niha zêdetirîn mirovên Girînê bi zaravayê Lekî diaxifin (Abbarîkî, h. 1392: 30). Baba Tahir wiha dibêje:

Mu derwêş im Lek im îcaz dîrim
Mu dosê çu Xoşîn hewraz dîrim
Mu maşûqê bi namî Fatime Lor
Sînew ber qametê pir naz dîrim (Şiwan, 2012: 28).

“Ez derwêş im, Lek im, xwedî îcaz im
Dostê çu Xoşîn, xwediyê razê hevpar im
Ez maşûqê ya bi navê Fatime Lor
Xwediyê sîneya ber qameta pir naz im”

Baba Tahir di dubeytîyeke xwe da xwe wekî niştecihê çiyayê Girînê dide nîşan:

مه طاهر ساکن پای گرینم مه درویش مسلک و اگر درینم

(Abbarîkî, h. 1392: 25)

“Ez Tahir im niştecihê Girîn im
Karê min derwêşî û hundir agirîn im”

Girîn (گرین), navê çiyayê Nûrabadê yê Loristanê ye. Li gorî vê helbestê Baba Tahir li wir jîyaye. Li gorî ravekirina Hemzê Êsfehanî û Şîrvîyê Bin Şehirdar, ev

her du cih jî (Girîn û Elwend) herêmên zimanê Pehlewî ne (Abbarîkî, h. 1392: 25), ku Çiyayê Elwend li Hemedanê ye û xelwetgeha Baba Tahir e. Dema ku em nivîsên lêkolînerên Lek yên derbareyê Baba Tahir dinihêrin têdigihîjin ku Baba Tahir ji herêma Lekan, wekî Lek û zaravayê wî jî wekî Lekî dipejirînin û helbestên wî jî bi Lekî û Lûrî tevlihev dibin. Di pirtûka “Salnamê Bihar” ya ‘Elî Muhemmed Sakî da hatiye nivîsandin ku “ji ber ku Baba Tahir li Hemedanê jîyaye divê em wî wekî Hemedanî bizanin.” Di serdema Baba Tahir da Hemedan ji hewzeyê Hekeranî (علی شکر / حکرانی) bû ku ev hewze ji Kirmanşah, nivê Kurdistan û Lûrîstanê pêk dihat. Zaravayê Lekî bi tevî Lûrî ji zaravayên rojavayê Îranê ne û zaravayên Kurdî ne. Di çavkanîyeke Lekan da tê gotin ku di destnivîseke ku ji destê Îmamxan Rostemî va tê destxistin ku ew ji herêma Celalevend ya ostanê Kirmanşahê bû û mezinê Ehlê Heq (Yarsan) ê wê herêmê bû, di wê destnivîsê da nameyek derbareyê Baba Tahir hebû û di wir da agahîyeke wiha hebû: Baba Tahir ji derwêşên Ehlê Heq yê herêma Delfan (دلفان) ya Lûrîstanê ye. Di gundê Zengîvend (زنگیوند) ya Delfana Nurabadê (نورآباد دلفان) jîyaye. Bi navê Mehmûd kurekî wî hebûye û ew xwedî mektebxane bûye û bi tdrîsê ra mijûl bûye. Di havînan gûndê navborî a damenê çiyayê Girînê û zivîstana jî li Xoramabadê bûye ku niha navê taxekî Xoramabadê Baba Tahir e û tirbeke wî jî li wir e. Di heman deme da li Xoramabadê xaneqaheke wî hebûye (<https://lakistan.persianblog.ir>). Di helbesteke wî da navê Delfan (دلفان) wiha derbas dibe:

ز شهر بیوفایان میگزیم

مه از دامان هجران میگزیم

بزون تا خاک دلفان میگزیم

اژای ماتم سرا با پای عریان

(<https://lakistan.persianblog.ir>).

Erdnîgarîya ku Kurdên Lek lê rûdinin û ji wir ra Lekîstan hatiye gotin, di nav erdnîgarîya dewleta Kurd Kasît (bz. 1680-1160) da bû (Ji Minorsky Neql: Gökpinar-Geliş, 2016: 22). Axa Lekîstanê di heman demê da di dilê dewlata Kurd ya Med/Mad (bz. 727-549) an da bû (Izady, 2013: 32). Herwiha Lekîstan û hawîrdora wê Kermanşah, Dînawar û Hemadan ji alfyê Selçûkîyan va wek Kurdistan hatiye navandin (Ji Zekî û Le Strange neql: Gökpinar-Geliş, 2016: 23). Li Lekîstanê zêdetir zaravayê ku wek binbeşeke Kurdîya Goranîyê ye tê axaftin ku ev herêm navenda bawerîya Yarsan e. Bi rêjeyeke kêma Kurdên kelhor li vir hene. Ev herêm di bin bayê nerm yê asîmilasyona Farisî, Lûrîyê da ye (Ji Chevalier neql: Gökpinar-Geliş, 2016: 23).

Baba Tahir di nav pirtûkên derbareyê ewlîya û şêxên wê deme da cihê xwe negirtibû ku sedemê vê yekê jî ji alîye Zerînkûb va hatiye dîyarkirin ku ji cudabûna koma wî ye, lê di pirtûka ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî (kd. 1131) ya bi navê “Nameyan” (h. 520-525) da navê wî wekî Tahir derbaz dibe lê bernava wî ya Baba derbaz nabe ku di pirtûkê da Bereke û Fethe wekî murîdên Tahir hatine nasandin ku bi tevî amaje û dîyardayan xuya dibe ku ev Tahirê ku tê behs kirin, Baba Tahir e (Zerrînkûb, h. 1376: 192-193). Murîdên wî Bereke û Fethe li ser bawerîya Yarsan in. Yarsan jî bawerîyeke Kurdan e. Baba Tahir di bawerîya Yarsan da ferîşteyê ku heyama wî ya Şa Xoşîn heman e û ev heyam di bawerîya Yarsan da wiha ye: Heyama Xoşîn, Baba Bozorg, Baba Faqîh, B. Hesên, **Baba Tahir**. Di Helbestên Baba Tahir da navê Şa Xoşîn derbaz dibe ku Baba Tahir ji bo wî ra girîngî, nirx û hezkirineke berz nişan dide, di serpehatî û helbestên Şa Xoşîn û Yarsanan da navê Baba Tahir bi awayekî rêzdar derbaz dibe. Di vê bawerîyê da Baba Tahir ferîşteyekî Yarsan e û puxteya Xwedê di wî da tecelî kiriye. Di helbesteke pêgirtiyên Yarsan yê bi navê Farix da Behsa Baba Tahir û Elî Qelender hatiye kirin. Wî di helbesteke xwe da navê ‘Elî Qelender û Tahir Qelender anîye ziman ku her dû mezinên bawerîya Yarsan in. Her wiha di helbestê de tê dîtin ku ji alîyê manewî va rihê Baba Tahir û ‘Elî Qelender heman in, yanê yek in. Ev mezinê Yarsanê yê bi navê ‘Elî Qelender behsa Şa Xoşîn dike û dibêje ku Şa Xoşîn bi nehsed kesî ve çûye Hemedanê serdana Baba Tahir. Li ser vê mêvandarîya Şa Xoşîn bi çûyîna wî ya bi Hemedanê, bi mêvandarîya wî ya ‘Elî Qelender ev helbest hatiye nivîsîn: (Xeznedar, 2001:188).

Şam bî ve mîhman, şam bî ve mîhman
Alî nan Alî şam bî ve mîhman
Çenî nohsed baş qelenderan
Baba Tahir bîm, mêrdî Hemedan (Xeznedar, 2001:189).

“Şa bûye mêvan, Şa bûye mêvan
Ez im ku mirovê mezin Şa bûye mêvan
Nehsed kes ji qelenderan bûne mêvan
Ez Baba Tahir im xelkê Hemedan”

Piştî mirina Baba Tahir (1010), Selçûkî radihêjin ku li ser erdnîgarîya Îranê bibin desthilat. Rojhilata Îranê bi dest dixin ber bi navîn û rojavayê Îranê ber alî dibin. Çav dikûtin bajarên kurdan ku yek ji wan bajarên Hemedan e. Di wê serdemê da Kurd li Hemedanê xurt bûn û esas şênîyê Hemedanê Kurd in. Îbn Fadlullah el-Ömerî û dîroknûsên din, Hemedanê wek navendeke girîng ya Kurdan dinavînin û dibêjin Hemedan (Ekbatana) navenda dewleta Kurdan ya Medyayê bûye¹¹ (Ji Kazvînî, el-Ömerî, Diagu, Doski neql: Demircan-Akbaş,

¹¹ Ev agahî ji alîyê edîtorê pirtûkê Mehmet Akbaş va, ji Fevziye Yûnus Fettah, ji zimanê ‘Erebî bi tirkî va hatiye wergerandin.

2015: 132). Sultan Sencerê (1118-1157) Selçûkî navê Kurdistanê li cî warê Kurdan dike, êdî Hemedana ku Baba Tahir dibêje ez xelkê wir im, ji herêma ku wek Lûristan dihate navandin, di serdema Sûltan Sencer dibe yek ji navendeke eyaleta Kurdistanê (Blau, 2012: 9). Navenda vê eyaletê jî kela Bahar e ku ev kel dikeve bakûrê rojhilata Hemedanê (Nikitin, 2013: 56).

Xeznedar tîne ziman ku li ser hevdîtina Baba Tahir û Şa Xoşên lêkolînek ji aliyê lêkolerê Rûs ê bi navê V. Îvanov hatiye kirin. Di wê lêkilînê da axaftinek di navbera Baba Tahir, Şa Xoşên û Fatmelere da heye. Bi vê axaftina xweşik mirov dihele. Bi taybet ev jin xwediyê baweriyêke pak û pîroz e û li gel Baba Tahir e (Xeznedar, 2001: 189). Navê Fateme Lor di helbesteke Baba Tahir da wekî “Mu maşûqê bi namî Fatime Lor” derbaz dibe ku Fateme herwekî ku tê zanîn Kurd e û xwedî helbestên zaravayê Goranî ne ku me li jor dabû zanîn. Di heman demê da helbestên Baba Tahir di kêlekên rûpelên pirtûka Yarsan a Serancamê da nivîsar in (Zerrînkûb, h. 1376: 194). Tê dîtî ku têkilîyên Baba Tahir bi Lekan ra heye herwiha têkilîyên wî bi Yarsanan ra jî xurt in ku wisa dîyar e ku Baba Tahir bi wan ra bi heman zimanê va axivîye ku ew ziman, zimanê qedîm û kevnar yê rojhilata navîn yê Mezopotamya û Îranê ye.

Zimanê Kurdî zimanekî dewlemend e, xwediyê zarava û devokan e. Abbarîkî tîne ziman ku, “Reşîd Yasmî zimanê Kurdî bi çar zaravayan va dabeş kiriye: Goranî, Kurmancî, Lûrî û Kelhorî. Moradê Ûreng jî wekî Soranî, Hewramî, Badînanî, Lûrî û Bextîyarî dabeş kiriye” (Abbarîkî, h. 1392: 28). Lûr, wekî civakeke Kurd ji Lûlû, Kaşî û Gutîyan pêk hatine. Lûr, navê xwe ji navê herêmeke newala Lûr girtine. Newala Lûr li gundê Kurd û li bajarê Mîyanrûdê ye (Yıldırım, 2013). Tewfîq Wehbî di sala 1951’an da nexşeya dabeşkirina dîyalektên zimanê Kurdî weşandiye ku ev nexşeya zimanê kurdî hemû herêmên Kurdan dihundirîne. Wi zaravayên Kurdî wiha dabeş kiriye: Kurmancî, Lorî, Goranî, Zazakî. Lûrî/Lorî jî wiha dabeş kiriye: Bextîyarî, Lekî, Feylî, Kelhorî, Mamesanî (Qanadê Kurdê, 2013: 25).

Bernava Baba Tahir ya “lûr” ku ev carinan jî wek “lûristanî” tê gotin jî derbarêyê qewmîyeta wî da nîşaneyek din e. Xeznedar tîne ziman; rojhilatnasê bi navê Mînorsky anîye ziman ku, Baba Tahir ji aliyê Lûrî va Kurd e (2001: 191). Herçiqas Lek, Baba Tahir wekî Lek dizanin, Lûr jî wî wekî Lûr û zaravayê wî jî wekî Lûrî dipejirînin. Baba Tahir ji alîye giştîyê lêkolîneran va him ji ber bernava wî ya Lûrî, him ji ber zimanê helbestên wî yê nêzikî Lûrî û him jî herêma ku lê jîyaye Hemedan û Lûristan in, wî wekî Lûr dipejirînin. Di heman demê da Lekî hin caran wekî zaravayê Lûrî hin caran jî wekî zaravayê Goranî hatiye dabeşkirin. Dîsa jî em dikarin bêjin ku Lûrîbûna wî ji ber jîyana wî ya Hemedanê tê û ji aliyê kesên din va ji wî ra Baba Tahirê Lûrî hatiye gotin, lê wî Lekbûna xwe di dubeytîyêke xwe da bixwe anîye ziman. Herwekî tê zanîn di Kurdbûna Lekan da tu arîşe tune lê Sağniç dibêje; Kurdbûna Lûrîyan heta

dawîya çarîka yekem a sedsala bîstan ajotiye. Heta sedsala bîstan hemû Farisan kurdbûna Lûrîyan pejirandine. Di vê sedsala me da, ji bo neyê gotin ku wêjeya Îranê ya pêşîn ji aliyê yekî Kurd va (ku Baba Tahir e) hatiye nivîsandin; beşek ji Farisan înkara kurdbûna Lûrîyan dikan. Lê belê Lûr Kurd in û berî navê Kurdistanê navê erdê wan hebû û ew Lûristan bû (Sağniç, 2002: 69). Di pirtûkên girîng yên dîrokî û yên serdemên cuda da derbareyê Lûran agahî wiha ne:

Erdnîgarnas û geryarê Îslamî, Îbn Havkal ku ew berîya sala 320/932'an hatiye dinê (Şeşen, 1999: 34-35) dîne ziman ku “el-Lûr cihekî xwedî axake bi bereket e û li vê bajarê hewayê çiyayî bi bandor e. Ev der berê girêdayê Hûzîstanê bû û niha bi Cîbalê va hatiye girêdan. Li vir Kurd zêdetir in. Îbn Havkal behsa erdnîgarîya cîbalê dike û dibêje ev der bi taybet başûrê Kurdistanê û rojavayê Îranê digire di nav xwe, herwiha ev bajar bi Kurdên Hezbanîye, Larîye, Humeydîye, Şehrezûr û Suhreverd va binecih in (Ji Îbn Havkal neql: Çetin, 2013: 25-26).

Yâkût el-Hamevî (575/1179-626/1229) dine ziman, ku Lûr eşîreke Kurdan e ku di navbera Esbehan û Huzîstanê li çiyayan dijîn. Ev herêm bi wan va tê zanîn. Ji vê herêmê ra el-Lûrr an jî Lûristan tê gotin (Ji Yâkût neql: Çetin, 2013: 25).

Ebu'l-Fîda (701/1301-774/1373) derbareyê Huzîstanê wek mijareke girîng cih dide Lûr û çiyayê Lûristanê, ew dine ziman ku li çiyayên Lûristanê civakên mezin yên Kurdan dijîn ku hukûmdarê Lûran jî nav wan yên bijarte ne (Ji Ebu'l-Fîda neql: Çetin, 2013: 37).

Şerefxanê Bedlîsî (kd. 1603) di pirtûka xwe ya “Şerefname”yê da êl û eşîrên Kurdan ên sereke wiha dabeş kiriye: Kurmanc (Kirmanc), Lûr, Kelhor, Goran (2014: 63).

Nivîskarê Osmanî yê navdar Şemseddîn Samî (1850-1904) di pirtûka xwe ya bi navê “Kamûsû'l-A'lam”ê da derbareyê Kurdan, Lûristan û Lûran da agahî dide û dibêje; Lûr li rojavayê Îranê rûdinin û milekî Kurdan in, Ji ber navê wan, ji vê herêmê ra Lûristan hatiye gotin (1316/1898: 4011-4012).

Ziya Gökalp (1875-1924) yê ku damezirînerê Tirkperestîya modern e, di navbera salên 1900-1910'an lêkolînen civaknasîyê dike û pirtûkek bi navê “Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler” dinivîse. Ew di bin sernivîsa “Kürtlerin Sınıflandırılması” da Kurdan wiha dabeş dike: “Kurmanc, Zaza, Goran, Lur û Soran”. Gokalp bahsa van beşên Kurdan û zimanê Kurdî dike, herwiha behsa zarava û devokên wan beşan dike û dibêje ev hemû ji Kurdîya qedîm ya kevn derketine. Ew dîne ziman ku Kurdên Lûr li Îranê ne û Baba Tahirê Uryan bi Lurî nivîsandiye (2013: 5, 30-32).

Di demajoya dîrokê da tê dîtin ku Lûr milekî Kurdan in û axa Lûrsitanê jî axa gelê Kurdan e. Baba Tahir li axa Lûristanê navdar bûye ku jê ra Baba Tahirê Lûrî yan jî Baba Tahirê Lûrîstanî hatiye gotin. Lê Baba Tahir di dubeytîyên xwe da vê nasnava xwe bi kar neaniye. Lûrî yan jî Lûrîstanî wek nasnavek, li wî

kirine. Her çiqas di serdema me ya îroyîn da derbareyê Lûran da yên ku dibêjin Lûr Faris in, yan jî Lûr qewmeke cuda ye hebin jî, ev gotin mijara me tevlihev nake ku, em mecbur in qewmîyeta Baba Tahir di serdema wî da bigerin û nîşan bikin. Dibe ku di roja me ya îroyîn da ji ber mezheba Şîfîyê yan jî bi sedemên cûda Lûr xwe wek Faris bihesibînin, yan jî Faris ji ber hin sedeman wan ji xwe bihesibînin. Dîsa dibe ku ji ber sedemên civaknasî û polîtîk, Lûr ji Kurdan dîrçûbin, herwiha ji aliyê çand û ziman va ji Kurdan cudatîyên kifş nîşan dabin û xwe wekî neteweyek cûda hîs bikin jî. Lê li gorî belgeyên dîrokî û bîra dîrokî, Lûr wek milekî Kurdan derdikevin pêş û Lûristan wek navendeke girîng ya gelê Kûrdan xwe nîşan dide. Bi vî awayî Baba Tahir di serdema xwe da ji aliyê nasnava xwe ya Lûrî/Lûristanî va wek helbestvanekî Kurd derdikeve pêş.

Derbareyê zimanê wî nîşaneyek din ev e ku Baba Tahir di dubeytîyeke xwe da xwe wekî ustadê zimanê Pehlewî navandiye û wiha gotiye:

Ez ustadê zimanê pehlewî me
Ji kitêba evîne re mester im
Ey Xweda eşqa Tahir bênîşan e
Ku ji eşqa seneman bê pî û ser im (Sağniç, 2002: 70-71).

Sağniç îne ziman ku: Zimanê pehlewî maka zimanê Kurdî ye û jê ra Kurdîya Kevn jî tê gotin. Zimanê Pehlewî ku zimanê serdema Part û Sasanîyan bûye dişibe zimanê Kurdî ku nêziktirîn ku zaravayên Kurdî dişibin zimanê Pehlewî zaravayên Goranî û Lûrî ne. Gîw Mukrîyanî gotiye ku “Kevintîrîn pirtûka Kurdî ya bi navê “Dînkêrd” bi zimanê Pehlewî hatiye nivîsîn ku dişibe zaravayên Kurdî yên wekî Lûrî û Kelhorî. Mamoste Merdux jî anîye ziman ku “Pehlewî yek ji zaravayên Kurdî ye.” Îhsan Nûrî Paşa di pirtûka “Mêjûya bi navê Binc û regeza Kurd” da anîye ziman ku: “Zimanê Pehlewî ku di nav part û Sasanîyan da navdar e, her ew şêwe û zarava ye ku di nav Goranîyan da bi nav û deng e û niha jî jê ra Goranî dibêjin (Sağniç, 2002: 32-33, 71).

Abbarîkî dîyar dike ku hin nivîskarên berê, bajarên Farisîziman ji bajarên Pehlewîziman veqetandine. Wekî mînak; Hemzê Êsfehanî (mîladî 883?-971?) anîye ziman ku pênc heb zimanên Îranîyan hene: Pehlewî, Derî, Farisî, Xuzî û Suryanî (التنبيه على حدوث التصحيف). Padîşah serdemên kevn yên Îranê di qesr û civînan da bi zimanê Pehlewî axaftine. Ew dibêje di nivîsên nivîskarên berê ên mîna: Hemzê Êsfehanî, Şîrvîyê bîn Şehrdar û Îbn Mûqfê da dîyar dibe ku zimanê Pehlewî li rojavayê Îranê hatiye axaftin, ku niştecihên wir jî Kurd in. Abbarîkî dibêje, îro jî ez dibînim ku gelek peyvên Pehlewî di zaravayên cuda yên Kurdî da tên bikaranîn (Abbarîkî, h. 1392: 25).

Şemsê Qeys dibêje “ji ber taybetîyên dubeytîyên ku wek yên Baba Tahir hatine nîşandan dikare were gotinê ku ew di eslê xwe da ne Farisîya Derî ne, belku ew Fehlevî bin (<https://wikifeqh.ir/>). Firdewsîyê ku di serdema Baba Tahir da

jiyaye, ji bo ku berhema xweya “Şehnameyê” binivîse wekî çavkanî hewcedarî bi berhemên zimanê Pehlewî dîtiye û ji bo ji wan berhemên sûd wergire, piştra zimanê Pehlewî hîn bûye. Ji xwe çavkanîyên zimanê Pehlewî ji bo nivîsîna Şehnameyê ji çavkanîyên bingehîn in (Lugal, 2009: 22-25). Baba Tahir û Firdewsî hemdem in. Baba Tahir tîne ziman dibêje, ez ustadê zimanê Pehlewî me, Firdewsîyê Farisî jî ji bo ji çavkanîyên zimanê Pehlewî sûd wergire piştra zimanê Pehlewî ji rahîbên Zerdûştîyan hîn dibe (Firdewsi, 2009: 15-16). Ev jî ji alîyê ziman va cudabûna Baba Tahir ji helbestvanên Farisan yê serdema wî nîşan dide.

Azkaii tîne ziman ku ji zimanê Pehlewî ra Farisîya naverast jî tê gotin. Lê dewsa vê gotinê ji zimanê Pehlewî ra zimanê “Medîya Naverast” bê gotin rastir e (tê dîtin ku senifandina zimanê Farisî ya ku Pehlewîyê ji xwe ra dike bingeh nayê pejirandin). Olz Hewzin Îrannasekî Almanî ye ku yekem car wî gotiye ku ziman û nivîsîna Pehlewî dewama zimanê Medî ya kevnare ye. Diakonoff dibêje ku peyva “part û pars” navên Medî ne. Peyva ‘pars’ di zimanê Medî da tîne wateya cînarîyê. Her du jî cînar in (Azkaii, 1995: 167-171). Di vir da dîyar dibe ku Medan nav li wan kirine. Zimanê ku li ser axa Îranê hatiye axaftin nabe ku hemû wekî Farisîya kevn, ya naverast û ya nû bê dabeşkirin û ne rast e ku zimanê Kurdî yan di nav vê dabeşê da bê hesibandin û yan jî tune were hesibandin, ku ev helwest dûrî rewîşt û zanîstê ye. Lewra Kurd xwedîyê zimanê qedîm yê cîhanê ne û li ser axa Îranê bi Farisan ra cînar in. “Di dîrokê da Kurd wek “arî” hatine navandin ku bêjeya “îran”ê ji bêjeya “arî/arîyan”ê tê. Kurd jî “arî” ne ku Firdewsî di Şehnameya xwe da Kurdan wek “arî” dide nasîn (Aydınlu, 2012: 15). Kurd parçayeke girîng ya axa Îranê ne û wek qewm ji şaristanîyên kevn yê cîhanê ne. Elî Şerîatî Kurdan ji alîyê şaristanîyê va ji Yewnanan kevntir nîşan dide ku ew Kurdan wek çavkanîya medenîyet û çandê dide zanîn (1998: 71).

Baba Tahir di dubeytîya jor da zimanê xwe wekî Pehlewî navandiye. Izady dîne ziman ku zimanê zikmakî yê Kurdan ji du beşên bingehîn pêk tîne. Ya yekem Kurmancî (Bahdînanî-Soranî) ye, ya duyem Pehlewanî (Dimilî/Zazakî-Goranî) ye. Bahdînanî, Soranî, Dimilî û Goranî xwedîyê gelek devokan in. Di helbestên Baba Tahir da gelek peyvên Goranî hene. Her wiha gelek berhemên wêjeyî yê nivîsî yê ji 1000 salî jortir hene. Peyva Pehlewî ji peyva “Pahla”yê tê ku ew jî ji peyva “Pahlawand”ê derketiye. Pahla bi ihtîmaleke mezin herêma ku ziman ji wir derketiye holê, ji Kurdîstana Başûr û bakûrê Lûrîstanê pêk hatiye. Peyva Pahla bi awayekî xirab bûye, bi peyva Feylî va guherîye û Feylî niha navê êleke / eşîreke Kurdan e, ku ev êl niha li başûrê Kurdistanê di herêma Pahlayê dijîn (Izady, 2011: 299). Zimanê Pehlewî di serdema şahên Sasanîyan de fermî bûye. Farisîya naverast, Farisîya nû û bi giştî zimanên Îranî ketine bin bandora Pehlewîyê (Xeznedar, 2001: 184-203). Di encama vê bandorîyê peyvên Pehlewî di nav zimanên Îranî da cih girtine û ev peyvên ji bo tevî zimanên Îranî bûne peyvên hevpar. Ev peyvên hevpar ên ku di dubeytîyên Baba Tahir da hene, zimanê dubeytîyan nake zimanê Farisî û ji alîyê qewmîyetê va Baba Tahir jî

nake Faris. Dema ku li dubeytîyên wî, agahî û çavkanîyên girîng yên derbareyê wî tê nêrîn derbareyê Farisî û Farisbûna wî tu agahî bi dest neketine.

3- Encam

Dîroka edebîyata Kurdî û ya Farisî bi qasî xwe dewlemend in. Her du edebîyat jî xwedîyê gelek berhemên giranbûha ne. Hevparîyên Kurd û Farisan ji alîyê erdnîgarî, ziman, dîrok û edebîyatê va gelek in û ev her du qewm/netewe nêziktirînê hev in. Di vê xebatê da me li ser qewmîyeta Baba Tahirê Îranî yê ku bi jîyan û berhemên xwe ji bo Kurd û Farisan xwedî nirxeke bilind e, lêkolînek pêk anî. Herwiha me di vê xebatê da rahişt ku li ser qewmîyeta wî bi belge û şîroveyan bigihîjin encamekê.

Ji bo sofiyekî mîna Baba Tahir çawa ku ‘Elî Şerî’etî anîye ziman yê ku di hundirê wî da bi qasî cîhanan ronahî, xwedî merîfet û bi qasî zeryayan xwedî zanîn û ji rastîya hebûnê têgihîştîye ra netewetî ne girîng be jî, lê çawa ku Xwedê mirovan qewm bi qewm afirandîye û her qewmek xwedî zimanekî ye, di heman demê da ji bo mirovekî mîna Baba Tahir qewmîyet girîng e jî. Ji ber vê Şerî’etî li kêleka taybetîyên wî, ji alîyê qewmîyetê jî wî daye nasîn û gotiye ew Kurd e (Shariati, 2009: 180) ku nasnameya wî tamam kiriye û wî daye nasîn. Lewra her helbestvan, wêjevan û zanyar ji neteweyekî ye û li ser çand û rastîya wê neteweyê teşe digire û digihîje. Herwiha bi berhemên xwe bandor li ser neteweya xwe pêk tîne û teşe dide wê. Ew, bi hebûna xwe di nav neteweya xwe da û bi berhemên xwe di nav dîroka edebîyata neteweyekî da cih digire.

Angaşta Farisbûna Baba Tahir wiha hatiye palpiştîkirin: “Baba Tahir Faris e, ji ber ku di nav helbestên wî da peyvên Farisî pir in” yan jî “zimanê berhemên Baba Tahir Lûrî ye ku Lûrî zaravayeke Farisî ye, yan jî Lûrî, Farisîya kevn e û hwd.” Lê dema ku angaştek were kirin divê bi awayekî zanistî were ravekirin. Ji lêkolînan dîyar dibe, ji ber ku resenên helbestên Baba Tahir negihîştîne roja îro û helbestên wî bi rêya devkî hatiye veguhaztin, di van veguhaztinan da helbest guherîn xwarine û peyvên Farisî ketine nav helbestan, bi domara demê ra kesên ku helbestên wî xwendine yan jî nivîsîne li gorî çêja huner û zimanê xwe, helbestan nêzîkî zimanê Farisî kirine, ku çapên dawîyê yên helbestên wî gelek nêzîkî zimanê Farisî bûne. Lê helbestên çapên cuda û helbestên Baba Tahir yên di pirtûka destnivîsî ya Qumî (sedsala XV) da hene vê guherînê û guhartinê radixe li ber çavan. Herwiha derbareyê guhertina zimanê helbestên wî lêkolînerên ku li ser helbestên wî xebat kirine, bi giştî lihev kirine.

Gotina Baba Tahir “Emseytu Kurdîyyen va esbehtu “Erebîyyen” (Ez ketim xewê Kurd bûm û sibehê hişyar bûm “Ereb im) wek gotineke Baba Tahir hatiye tomarkirin, ku ev gotin ji mêj va di nav gelên herêma Baba Tahir û hawirdora wê herêmê da wek gotina Baba Tahir hatiye pejirandin. Di dîwana Baba Tahir ya ku ji alîyê Wehîd Destgirdî hatiye amadekirin, ew dîwana ku herî muteber tê

dîtin da ev gotin wek ya Baba Tahir hatiye tomarkirin. Ji alîyê lêkolînerên rojavayî wek gotina Baba Tahir hatiye nasandin. Ev gotin di pirtûka Şeddu'l-'Izarê da bi çend kesan va hatiye nîsbetkirin ku du kesên girîng ji wan Baba Tahir û Ebul Wefayê Kurd in. Yanê gotin li ser du kesên Kurd hatiye nîqaşkirin. Encama nîqaşê ji alîyê qewmîyetê va Kurdbûna Baba Tahir nîşan dide.

Baba Tahir di helbesteke xwe da dibêje: “Ez derwêş im, Lek im, xwedî îcaz im”. Ev derbareyê nasnameya wî da dîyardeyeke din e, ku Lek Kurd in. Baba Tahir ji vê herêmê ye, piştî demekê ji vê herêmê diçe Hemedanê, lê ew li Hemedanê navdar dibe. Bernavên xwe yên Lûrî/Lûrîstanî û Hemedanî li wir digire.

Ew zimanê pehlewî baş dizane û di helebesteke xwe da dibêje: “Ez ustadê zimanê Pehlewî me”. Helbestnûsên serdema wî bo mînak Firdewsî, ji bo mesnewîya xwe binivîse û ji çavkanîyên pehlewî sûd werbigire Pehlewîyê piştra hîndibe. Lê Baba Tahir xwe wek pisporê vê zimanê dide nîşandan. Cihê zimanê Pehlewîyê rojavayê Îranê ye ku Kurd li wir ji mêj va ne nişîn in. Dîsa zimanê helbestên wî ji zimanê helbestnûsên Faris yên serdema wî cudatir e ku ev jî cudatîya wî bi helbestnûsên Farisan nîşan dide.

Bernava wî ya Lûrî jî nîşaneyek ji nasnameya wî ye. Lûrîstan parçeyeke erdnîgarîya Kurdan e û berfireh e. Di dîrokê da her tim Lûr wek zaraveyeke sereke ya zimanê Kurdî hatiye tomarkirin ku ew kesên tomar kirine me bi çavkanîyên dîrokî û yên serdemên cuda di xebata xwe da anî ziman. Lê niha pêleke nerm ya asimilasyonê li ser wê herêmê heye. Hin kes angaşt dikin ku Lûrî zimanê serbixwe ye ku yên ku berevajîyê vê radîbin jî hene. Ev nîqaş him li ber bayê pişavtinê, him jî bi çavên îro yê zimanasîyê pêk tên. Lê di dîrokê da di serdema Baba Tahir da Lûr Kurd in û Lûrî zaraveyeke Kurdîyê ye.

Helbestvan di helbesteke xwe da dibêje “Ez Tahir im niştecihê Girîn im” ku Giran di serdema wî da herêmeke Kurdan e. Di serdema Baba Tahir da navendeke Kurdan e. Herêma ku helbestvan hatiye dinê ji bo nasnameya wî girîng e û nîşaneyek nasnemaya wî ye.

Têkilîyên Baba Tahir yên ku bi Kurdên Yarsanan ra hene jî derbareyê ziman û nasnameya wî da dîyarde ne. Baba Tahir di vê bawerîyê da ferîşteyek e. Kurdên Yarsan wî yek ji xwe û wek ferîşteyekî bawerîya xwe pejirandine.

Giştîyê lêkolînerên rojavayî û yên Faris yên ku li ser Baba Tahir bi rêbaza zanistî xebitîne, derbareyê qewmîyeta wî da yan bi guman û ihtîyat nêzikî vê mijarê bûne, yan jî gotine ew Kurd e. Lê Farisbûna wî neanîne ziman. Ji alîyê zimanê helbestên wî yan gotine zimanê helbesta wî Lûrî ye, yan jî gotine Lûrî ye û Lûrî zaraveyeke Kurdî ye, herwiha yan jî gotine helbestên wî bi zimanê devera wî ye (deverî ye) û bi peyvên zaravayên Kurdîyê va tevlihev in.

Wekî gotina dawî, ji agahiyên dîrokî û lêkolînan dîyar dibe ku zimanê resen yê helbestên wî bi zimanê ku li rojavayê Îranê hatiye axaftin ra pêwendîyeke xurt

dihewîne ku ev ziman zêdetir bi zarava û devokên Kurdî va, yên Lûrî/Lekî/Goranî va, têkil e. Herwiha dîyar dibe ku Baba Tahir ji aliyê qewmîyetê va Kurd, ji aliyê milên Kurdan va Lûr û Lek, ji aliyê herêma ku navdar bûye ve Hemedanî/Lûrîstanî derdikeve pêş.

Çavkanî

- Abbarîkî, S. A. H. (H. 1392). “Nêgahî Tazê Be-Zebanê Şê‘Rê Baba Tahêrê Hemedanî”, *Kêtabê Mah Edebîyat*, j. 80, Azermah.
- Adak, A. (2013). *Destpêka Edebiyata Kurdî Ya Klasîk*, İstanbul: Nûbihar.
- Aydınlu, S. (2012). *Firdevsi'nin Şehnâmesi'nde Kürtler*, Çeviri: Erkan Çardakçı, İstanbul: Avesta.
- Aytaç, G. (2019). *Karşılaştırmalı Edebiyat Bilimi*, 2. Baskı, Ankara: Doğubatı.
- Azamat, N. (2001). “Kalenderiyye”, *Dia*, XXI, İstanbul: Tdv Yayınları.
- Azkaii, P. (1995). *Baba Tahir-Name*, Tehran: Tus.
- Baba Tahirê Hemedanî (1932), *Dîwanî Kamil Baba Tahir*, ç. 2, Tehran: Neşrîyata Mecerleya Armaghan.
- Bahaudînê Qûmî (848 /1469), *Pirtûka Destnivîsî*, Konya: Mevlana (Etnografya) Müzesi İhtisas Kütüphanesi.
- Bilgin, O. (1993). “Cüneyd-i Şîrâzî”, *İslam Ansiklopedisi*, Cilt 8. İstanbul: Tdv.
- Blau, J. (2012). *La Littérature Kurde*, Fondation-İnstitut Kurde De Paris 106, Paris: Rue La Fayette.
- Cebecioğlu, E. (2004). *Tasavvuf Terimleri Ve Deyimleri Sözlüğü*, 2. Baskı, İstanbul: Anka Yayınları.
- Çelik, A. F. (2015). “Bâbâ Tâhir-İ Hemedânî Divanının Mehdî-İ Hamîdî Nüshasında Geçen Dobeytîleri Ve Türkçe Tercümesi”, *Doğu Esintileri*, (3), 247-293.
- Çetin, S. (2013). *Yâkût El-Hamevî'nin Mu‘Cemü'l-Büldân Adlı Eserinde Kürtler*, Teza Lîsansa Bilind, Dicle Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Diyarbakır.
- Demircan, A.-Akbaş. M. (2015). *Kürtler (Tarih)*, Ç. 2, İstanbul: Nida.
- Destgirdî, W. (1929). “Baba Tahirê Uryan”, *Mecelle Armaghan (مجلة أرمغان)*, s. 9, اسفندماه 1307, j. 10.
- Firdevsi (2009). *Şahnâme*, Wer. Necati Lugal, İstanbul: Kabalcı Yayınevi.
- Gökpınar, M.; Geliş, A. C. (2016). *Lek Küretleri Çukurova Lekvanikleri, Haymana Lek Şahbazanları, Bingöl Bermeki Lekleri*, İstanbul: Do.
- Gökalp, Z. (2013). *Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler*, 2. Baskı, İstanbul: Toker.
- Heron-Allen, E.-Brenton, E. C. (1902). *The Lament Of Babatahir Being The Rubaiyat Of Baba Tahir Hemedani (Uryan)*, London: Gilbert And Rivington Ltd.

- Izady, M. R. (2011). *Kürtler Bir El Kitabı*, Ç. 4, (Wer.: Cemal Atila), İstanbul: Doz.
- Kara, S. (2012). *Dubeytî Baba Tahirê Uryan*, Ç. 3, Stenbol: Nûbihar.
- Kemikli, B. (2013). *Türk İslâm Edebiyatı*, “Din ve Edebiyat” Editör: Hasan Aksoy, Eskişehir: Anadolu Üniversitesi Yayını.
- Kerim, A. H. (2011). *Balkan Yarımadasında Kürtler*, İstanbul: Evrensel Yayınları.
- Köprülü, M. F. (1980). *Türk Edebiyatı Tarihi*, Amadekar: Orhan F. Köprülü-Nermin Pekin, İstanbul: Ötüken Yayınları.
- Mevlâna Celâleddîn Rûmî (2004). *Mesnevî*, (Amd.: Adnan Karaismailoğlu), c. I, İstanbul: Yeni Şafak Yayınları.
- _____, (2004). *Mesnevî-İ Şerîf Şerhî*, (Çeviri ve Yorum: Ahmed Avni Konuk), İstanbul: Gelenek Yayınları.
- Minorsky, V. (1997). “Baba Tâhir ‘Uryan”, *İslâm Ansiklopedisi*, Ç. 5, I-XII, Eskişehir: M. E. B. Yayınları.
- Muînuddîn İbnu’l Qasim Cuneydê Şîrazî (Şemsî 1328). *Şeddu’l-‘Izar Fî Hattî’l-Evzar ‘An Zuvvarî’l-Mezar*, B. 3, Tehran: Mohles.
- Modarreszadeh, A. (1392/2013). “Mergê Endîşehayê Baba Tahir”, *Fesnamê ‘Irfaniyat Der Edebê Fairsî (Edeb Ve ‘Irfan Edebistan)*, Serdem 4, J. 15, 95-108.
- Nikitin, B. (2013). *Kürtler Sosyolojik Ve Tarihi İnceleme*, 6. Baskı, İstanbul: Deng.
- Ocak, A. Y. (2004), *Türk Sufiliğine Bakışlar*, İstanbul: İletişim Yayınları.
- Öztürk, M. (2014). “Divan Şairinin Nimet Ve İktidar Ekseninde Ulusları Ötekileştirmesi”, *A. Ü. Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi [Taed]*, s. 51, 63-88, Erzurum.
- Rawendî, (Muhammed Bîn ‘Elî Bîn Soleyman) (H. 473). *Rahetu’s-Sudûr We Ayetu’s-Surûr Der Tarîxê Alê Selçûq*, Têhran: Asatîr.
- Rawlinson, G. (2006). *Medya Krallığı*, İstanbul: Doz.
- Sağniç, F. H. (2002). *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Stenbol, Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê.
- Sâmî, Ş. (1316/1898). *Kâmûsu’l-A ‘Lâm*, c. VI, İstanbul: Mihran Matbaası.
- Secadî, ‘E. (1391). *Mêjûy Edebî Kurdî*, Weş. Sine: Bilavkirdnewey Kurdistan.
- Sefa, Z. (1369/1990). *Tarîxê Edebîyat Der Îran*, b. 2, ç.10, Tehran.
- Şerefhanê Bedlîsî (2014). *Şerefname (Dîroka Kurdistanê)*, (Wer.: Ziya Avcı), Mersin: Azad.
- Şeriati, A. (2009). *Hubut Der Kevîr*, <http://Shariati.Nimeharf.Com/>.
- (1998). *Medeniyet Ve Modernizm*, Ç. 5, (Wer.: Ahmet Yüksek), İstanbul: Birleşik Yayınları.
- Şeşen, R. (1999). “İbn Havkal (ابن حوقل)”, *Tdv İslâm Ansiklopedisi*, c. XX, 1999.
- Şiwan, Î. E. (2012). *Edebê Kownî Kurdî*, Hewlêr: Zankoy Selehedîn.

- Temo, S. (2013). *Kürt Şiiri Antolojisi. II*, İstanbul: Agora Kitaplığı Yayınları.
- Tenik, A. (2015). *Tarihsel Süreçte Kürt Coğrafyasında Tasavvuf Ve Tarikatlar*, İstanbul: Weş. Nûbihar.
- Uluçay, Ö. (2010). *Ehl-İ Hak Baba Tahir Uryan Zerdüşt*, Adana: Gözde.
- Xeznedar, M. (2001). *Mêjûy Edebî Kurdî*, Weş. Aras.
- _____ (2004). *Yekemîn Rojên Edebiyatê Li Diyarbekirê, Gotarên Konferansa Edebiyata Rojhilata Navîn û Pirçandiyê*, 4-6 Sermawez 2003, Stenbol: Weş. Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê.
- Xodayî, Î. (1397/2013). *Baba Tahirê Hemedanî Ve Ş'irî Amixtê Farisî-Lorî*, <http://Loor.Ir/> /: باباطاهر - همدانی - و - شعر - آمیخته - فارسی - لاری /: Gihîn: 01/06/2020.
- Qanatê Kurdo (2010). *Rêzimana Kurdî Kurmancî-Soranî*, Ji Kurdîya Soranî Zülküf Ergün, İstanbul: Nûbihar.
- Yavuzer, M. N. (2016). *Baba Tahir Di Wêjeya Kurdî De*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Van.
- Yazıcı, T. (2012). "Baba Tâhir-İ Uryân", *Dia*, IV, İstanbul: Tdv. Yayınları,
- Yıldırım, K. (2013). *Baba Tahirê Uryan Hayatı Görüşleri Dîwanı*, Stenbol: Avesta.
- Yıldırım, N. (2015). Rûdekî-Yi Semerkandî (Ö. 329/940). *Doğu Esintileri* , (3), 133-194.
- Zerrînkûb, 'E. (H. 1376). *Custucû Der Tesewifê İran*, Ç. 5, Weş. Tehran: Muesese-Ê Intişarat Emîrkebîr.
- <https://Lakistan.Persianblog.Ir/>, "باباطاهر عریان لک؟ یا همدانی"
- "Dêhxweda" [<http://Parsi.Wiki/Dehkhodasearchresult-Fa.Htm>), Gihîn: 15/02/2020.
- <https://Ku.Wiktionary.Org/>, Gihîn: 15/06/2020.
- <https://Wikifeqh.Ir/> باباطاهر , Gihîn: 10/05/2020.